

WEELAT

Komployê qesta MED TV'yê jî kir:

Kurdistana li ezmên nayê girtin



- ✓ **PKDW:** Divê cîhan çavên xwe jî vê hovîtiyê re negire.
- ✓ **YRK:** Dewleta tirk di terora li ser kurdan de tu sînoran nas nake.
- ✓ **KKP:** Ev biryar polîtîk e, ku li dijî mafê me yê parastina zimanê zikmakî, çand û wergirtina nûçeyên rastîn e.
- ✓ **PSK:** Divê ev êrîşên li ser MED-TV'yê bi dawî bînin û ew jî nû ve dest bi weşana xwe bike.
- ✓ **MLKP:** Bi biryara girtinê ya MED-TV'yê li êrîşên jî bo tunekirina têkoşîna neteweyî ya kurdan yeke din zêde bû. (Nûçe: R.3)




Newroz li çar aliyên cîhanê jî aliyê kurdan û dostên wan ve hate pîrozkirin

AGIRÊ SERHILDANÊ GIHÎŞT METROPOLAN



■ Waliyê OHAL'ê berî Newrozê gotibû: "îsal pêjna serhildanê tê". Gotinên wî bi çalakîyên Kurdistanîyan ên di Newrozê de hatin çespan-din. Kurdistanîyan çi li Kurdistanê çi li Tirkîyeyê tevî astengiyên dijwar û berfireh jî, bi çalakîyên cur bi cur hêzên Tirkîyeyê tengezar kirin. Lewre rayedarên dewletê an gef li gel xwarin an jî şekir dane "generalên biçûk", lê "generalên biçûk" kevir 'diyarî' wan kirin. Polîsan li hin deveran zarok jî dane ber jopan. Li aliyê din gelek siyasethedarên tirk bo 'Nevrûzê' çûn Kurdistanê. Lê gel rûyê xwe jê bada. Bo nimûne li miþînga Mesut Yılmaz a li Sêrtê gel sloganên wekî "Bijî Serok Apo" qîriyan. (Nûçe-Newroz.R.8-9)

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang.usa.net

SAMI TAN

Dagirkeran bi talankeriya xwe, kurdan jî bi berxwedêrî û serhişkiya xwe nav daye. Em bawer in berxwedêriya gelê me dê zora talankeran bibe.

Talankerî û Newroz

Çanda her gelfî li gorî jiyana wî ya rojana teşe digire. Mîrov nikare jî gelekî ku bi ajaixwedîkirinê daketiye, çandeke li ser behrê hevî bike.

Dema mirov rewşa tirkan, nemaze jî serdestên tirkan binixîne, dê rastiyeke derkeve holê. Hozên tirk jiyaneke koçberî derbas kirine. Lewma jî kesên ku li ser zimanê tirkî xebat kirine didin zanîn ku, di zimanê tirkî de lêker gelek in, lê dema mirov bala xwe dide navdêr û rengdêran rewşeke din derdikeve holê. Wekî mînak; li ser navê fêkiyan ên ku niha tirk pê kar dikin bifikirin, ka çend heb jî wan bi tirkî ne?

Taybetiyeke din a wî gelfî ku di liv û tevgera serdestên wî gelfî de xwe dide der talankerî ye. Serdestên tirkan tiştê neafirandîye, çûne berên gelên din desteser kirine. Lewma jî pêdivî bi pêşvebirina rêbaz û hacetên hilberandinê nedîtine.

Gundiyan tirkmen, piştî ku dêmanî bûne dest avêtine xebatê, hin tişt hilberandinê lewre jî, di çand û rewîştên wan de hin guherîn pêk hatine ango hinekî kefî bûne û jî gelên derdora xwe hînî gelek tiştan

bûne, lê serdestên tirk li ser rêç û rêbazên berê çûne û lewre jî talankerî bûye taybetiya wan a sereke.

Vê taybetiya wan di nêzîktêdayina wan a li ser Cejna Newrozê de careke din xwe da der. Gelê-kurd bi salan e ku vê cejnê pîroz dîke û jî bo pîrozkirina wê xwîna xwe dide rijandin. Lê dagirker jî nişke ve pê hesiyar ku cejneke wan a bi navê "Nevrûz" heye. Wekî mînak jî pîrozbahiyên tirkên li Asyaya Navîn nişan didin. Li aliyekî hê jî jî ber pîrozkirina cejnê xwîna kurdan dirêjin, li aliyê din jî cejnê bi canbazî û hêkiçê pîroz dikin.

Tiştê ku herî zêde li zora mirov diçe jî ev e: Çapemeniya tirk dibêje, "Nevrûz di nava aşî û şahiyê de hate pîrozkirin, lê siya hinek komikên ku dixwestin bûyeran derxin ket ser pîrozbahiyên." Li hemberî vê rewşê gotineke gelêrî tê bira mirov: "De were nemire, nebihece". Gelo siya potînen reş ên kontrayên ku jin û zarokan didan ber jopan û zarokên 7-8 salî derdest dikirin ket ser pîrozbahiyên an a gelê ku dixwaze cejna xwe ya salan pîroz bike? Bêguman siya kontrayan.

Her wekî çawa talankerî wekî taybetiya sereke ya dagirkeran xwe dide der, berxwedêrî û serhişkî jî wekî rewîştên sereke ya gelê kurd xwe dide der. Em bawer in berxwedêriya gelê me dê zora talankeran dibe. Pîrozbahiyên ku pêk hatin jî vê rastiyeke diçespinin.

Hêzên dagirkeran berî Newrozê avêt ser Azadiya Welat, 9 hevalên me hatin binçavkirin û gelek pirtûk û materyalên nûçeyan hatin desteser kirin. Lê hevalên me di binçav de Newroz pîroz kir û hêviya wan di qirika wan de hişt.

Li aliyê din komploya navneteweyî ya li hemberî gelê me hê jî didome. Piştî digirtina Öcalan, îcar jî dengê gelê kurd MED-TV jî hêla Komîsyona Serbixwe ya Televîzyonê (ITC) a îngilîzan ve jî bo 21 rojan hate girtin. Qala îptalkirina însansê jî tê kirin. Divê hemû kurd li ser van tiştan hişyar bin û berteka xwe ya demokratîk nişan bidin.

Cejna Qurbanê ya hemû xwendevanên me pîroz be. Heta hefteye din bimînin di nav a xêr û xweşiyê de.

Kurdbûn gava yekem e bo xwenasîne

Ferhengok

CAN KURD

ajal: sewal, heywan
bertek: reaksiyon
beravajî: tersine
bergirî: tevdir (önlem)
berxwedêr: direnişçi
beşdar: katılımcı
bêguman: şüphesiz, tabî kî
bivê nevé: ister istemez
çalakdar: eylemci
çespendin: ispatkirin
destkarî: mudahale
dîber: muxalîf
êrî: saldırı
evrensel: evrensel
gîrê: cemawer,
gotar: makale
hevîde: denge
hevîre: yoldaş
hibîrtin: seçim
hibîrandin: havaya serpiştirmek
hoz: boy
ji buuşma, randevu: buluşma, randevu
lêanî: adaptekirin (uyarlama)
lêarîstin: düzenleme, organize
mafîdar: haklı
nakok: çelişik

navgîn: amûr (araç)
parêzgar: wâlî
pêjînkar: hesas
pejîrandin: qebûlkirin
pêjînkirin: hisetmek
pend: şîret (öğüt)
pêşawa: lider, önder
pîrozbahî: kutlama
piyar: dilovan, rehîm
qirçîlik: palyaço
radestbûn: reslîmbûn
ragihandin: iletîşim; bildirim
raperîn: serhildan
raya giştî: kamuoyu
rewîşt: ehlaq
ricimandin: lînkîkirin
rivîn: alev
serdem: heyam
serhildêr: asî
slogan hildan: slogan atmak
tawanbar: suçdar
vegotin: katîkirin (anlatmak)
vêsandin: vemirandin, temirandin
wegana yekser: canlı yayın
xêrîvevanî: şukîrkirin
xwelêweranî: hem-bêzkirin

Hinde caran ez mat dimînim, ji ber ku ez di rewşa taze de li kurdên der û dora xwe dinêrim, ténagihêjim çawa dijî û çî dixwazin.

Ew serpehatiya ku bi girtin û revandina birêz Abdullah Öcalan re bi serê me hatiye ne bûyereke rojane ye ku mîna girtin û revandina têkoşerekî be. Belkî ji roja bidarvekirina pêşewa Qazî Mihemed vir de tiştêkî wisa dijwar li Kurdistanê bi serê serwerekî kurd de nehatiye. Çawa ku yek kêreke zengirtî li birîna mirovekî bide, wisa bi serê me de hatiye. Lê mixabin! hîn em di xew de ne û em baş li rewşa xwe hişyar nebûne. Berê jî dihate gotin: "Hişê kurdan paşê tê serî."

Bêguman berî vê bûyerê gelek rexneyên min û kesên din li tevgera bakurê Kurdistanê hebûn û hîn jî hene. Lê belê piştî vê bûyerê, êdî divê her yek ji me jî xwe bipirse, gelo kêmasiyên me jî di dema bihurî de tunebûn? Ma çî bû ku cîhan wisa deriyên xwe

li rûye me bigire û me nepejirîne? Gunehê min bi xwe wekî kesekî çî ye? Çima vê bûyerê wiha rû da? û gelek pirsên din ên ku di mejiyê me de li bersivan digerin.

Bersivên pirsên min, ku gelek mirovên niştimanperwer bi hîstoberî jî xwe dipirsin, divê em di pêşerojê de, bi şeweyekî hevreyî

Ne tenê mirovên me yên belengaz û nezan bi tirkî dipeyivin, yên zana, rewşenbîr û pêşeng jî wisa ne. Ma ev ziman evqas bi me şêrîn e? Kesên ku dibêjin: "Gelê me bi kurdî nizane" xwe, dixapînin.

bidin gelê xwe, di xebat û têkoşînê de, me divê şahiyan xwe sererast bikin. Li xwe vegevin û hişmendiya xwe ya neteweyî û histobariya xwe li ber Xwedayê xwe jî nû ve ava bikin.

Lê niha ez dixwazim hinakî bi gelemperî li ser pirsê kurdbûnê rawestim...

Ez li kurdan dinêrim û dilteng dibim. Ji ber ku ew derdikevin rêveçûna ji bo eşkerekirin û cerisandina kiriyara dewleta tirk a fa-

şîst. Ji sibehê hetanî évarê, bi zarokên xwe re li derve, di bin berf, baran û seqemê de dimînin. Lê di nava xwe de, digel hev, bi zarokên xwe re li ber kamera û televîzyonan bi zimanê neyar dipeyivin.

Ne tenê mirovên me yên belengaz û nezan wisa dikin, yên zana, rewşenbîr û pêşeng jî wisa ne. Ma ev ziman evqas bi me şêrîn e? Kesên ku dibêjin: "Gelê me bi kurdî nizane" xwe, dixapînin. Ji ber ku kesên ku bi zarokên xwe re, bi rêhevalên xwe re dipeyivin bi kurdî jî mîna tirkî dizanin.

Ev bi piranî, gava rêveçûn diçe serî an jî li ber televîzyonê demeke dirêj dipeyivin û piştê birçî dibin, diçin dikane tirkan, ji wan kesên ku bi mal û pereyên xwe xezîneya leşkerî ya dewleta tirk tijî dikin, benî, tirşo û nanê xwe dikirin, bivê nevé alîkariya leşkeriya tirkan dikin.

Gelo em çima bi dengêkî bilind nabêjin "têkiliya xwe bi a-boriya neyar re bibirin"? Ez dibînim di vir de tozekê kurdbûnê pêwîst e.

Komployê qesta MED TV' yê jî kir:

Kurdistana li ezmên nayê girtin

Televîzyona Kurdî MED-TV bi bîrjara ITC jî bo 21 rojan hate girtin. ITC îdia dike ku di nûçeyên televîzyonê de banga şer hatiye kirin, lewma wan ev bîrjar girtiye. Lê berpirsên televîzyonê û saziyên kurd didin zanîn ku, ev bîrjar li ser daxwaza Serokwezîrê tirk Ecevit pêk hatiye û wekî delîla vê yekê jî dibêjin: "Bîrjar berî ku dinya pê bihese di televîzyoneke tirk de hatiye weşandin."

Heftiya çûyî amadekarên komploya navneteweyî qulpekî nû bi dest xwe ve anî. Komîsyona Serbixwe ya Televîzyonê (ITC) ku lîsans dabû televîzyona kurdî MED-TV, roja 22'yê adarê bi daxuyaniyekê da zanîn ku jî bo 21 rojan bîrjara rawestandina weşana televîzyonê daye. Li gorî daxuyaniya ITC, divê di nava van 21 rojan de berpirsên televîzyona kurdî parêznameya xwe ragihînin komîsyonê û komîsyonê dê li gorî wê yekê li ser aqûbeta televîzyonê bîrjareke nû bigire. Dibe ku di dawîya 21 rojan de lîsansa televîzyonê bi temamî were betalkirin. Di daxuyaniya ITC de hatiye îdia kirin ku, di bultena nûçeyan a MED-TV'yê de rojên 16,17, 18, 19 û 20'ê reşemiyê propagandaya şer û handana sûc hatiye kirin.

Li aliyê din berpirsên televîzyonê didin zanîn ku ev bîrjar bi zora Tirkiyeyê hatiye girtin.

Bo nimûne Sazûmankarê Giştî yê MED-TV'yê Hikmet Tabak digel parêzerên televîzyonê roja 24'ê adarê civîneke çapemeniyê li dar xist. Di vê civînê de Tabak li ser bîrjara ITC û êrişên li ser televîzyonê agahî dan û bal kişand ser rola dewleta tirk a di girtina vê bîrjarê de. Tabak got: "Em qet pê kêfxweş nebûn ku me berî her kesî nûçeyê ji televîzyoneke tirk bihîst." Bi vê yekê xwest bide zanîn ku berî bîrjarê jî haya dewletê ji bîrjarê bûye. Di civînê de Tabak da zanîn ku televîzyona Med dengê bi milyonan kurd e. Wî diyar kir ku kurdên ji her bir û baweriyê li MED-TV'yê temase dikin û li wê xwedî derdikevin.

Hikmet Tabak êrişên dewleta tirk ên bi rêbazên cur bi cur jî bi bir xistin û diyar ku jî roja ku MED-TV'yê dest bi weşanê kiriyê heta îro dawî li wan êrişan nehatiye. Her wiha wî da zanîn ku jî aliyê medyaya tirk ve şerekî psikolojîk li dijî wan hatiye meşandin û MED-TV wekî sedema Kêşeya Kurd hatiye destnîşankirin. Piştê jî wî got: "Em dê bibînin, ka di nava van 21 rojan de Kêşeya Kurd dê holê rabe an na."

Sazûmankarê Giştî yê MED-TV Tabak wiha dawî li axaftina xwe anî: "Rêveberiya MED-TV bîrjardar e ku di nava çalakiyên bo televîzyoneke ku deng li kurdan dike de cih bigire."

Her wiha Yekîtiya Rojnamevanên Kur-

distanê jî ev bîrjar bi daxuyaniyekê protesto kir û diyar kir ku mafê nûçegirtinê bi zora Tirkiyeyê jî destê kurdan hatiye girtin. Hatîye gotin ku dewleta tirk polîtîkaya xwe ya sansûr û terorê li ser medyaya kurd a li Ewropayê jî bi destê dewletên Ewropayê dide meşandin.

Ji bilî YRK, Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya, rêxistinên mîna PSK, KKP, Partiya Şores-Kawa, MLKP û gelek saziyên din ên demokrat û şoresger jî ev bîrjar şermezar kir.

Di daxuyaniyên li ser mijarê hatiye gotin ku ew bîrjar siyasî ye û bi zexta Tirkiyeyê hatiye girtin. Heta hinek pisporên mijarê didin zanîn ku hêza Tirkiye têrê nake ku bîrjareke bi vî rengî bide girtin, di girtina vê bîrjarê de jî tiliya Amerikayê heye.

Bîrjara girtina MED-TV'yê di çapemeniya tirk û cihanê cihêkî berfireh girt. Her wiha dihat gumankirin, bîrjar di çapemeniya tirk de wekî serkeftina duyemîn hate binavkirin. Lê çapemeniya cihanê da zanîn ku bi vê yekê gelê kurd jî mafekî bîngêhî bîpar maye. Bo nimûne, BBC'yê bûyer bi sernavê "MED-TV: Kurdistana li ezmên" ragihandiye. Di nûçeyê de li ser weşanên televîzyonê agahî hatine dayin. Piştî van agahiyan li ser sedemên bîrjara ITC û êrişên dewleta tirk ên li ser televîzyonê hatiye rawestandî. Di nava nûçeyê de van gotinên Dilêr Akreyî jî cih girtiye: "Hinek kurd vê televîzyonê wekî welatê li ezmanan dizanin."

Di nûçeyên ajans û çapemeniya biyan de "KTV"ya PDK'ê wekî reqîbê MED-TV'yê hatiye nîşandayin. Di nûçeya BBC'yê de jî vê yekê cih girtiye.

Ajansa AFP jî roja 23'yê adarê cih daye nûçeyê li ser çalakiyên kurdan ên li dijî vê bîrjarê. Li gorî nûçeya AFP'ê 250 kurd li deriyê ITC'yê gihîştine hev û wan ev bîrjar protesto kiriyê. Di nûçeyê de van gotinên beşdarekî çalakiyê yê bi navê Ahmet Uygun jî cih girtiye: "Bi girtina MED-TV'yê ve saziyê dengê me jî girt. Ev durûtî ye. Hemû televîzyonê li ser rûyê cihanê tiştên wisa diweşînin. Em ji welatekî di nava şer de ne. Ev bîrjar siyasî ye, ji ber Tirkiyeyê ev yek pêk hatiye." Çalakdar daye gotiyê heke MED-TV bi temamî were girtin, ew dê dest bi greva birçîbûnê bikin.

NAVENDA NÛÇEYAN



REAKSIYONÊN LI HEMBERÎ GIRTINÊ

PKDW: Divê cihan çavên xwe ji vê hovîtiyê re negire. Mafê gelekî ku hejmara wî 40 milyon e heye ku her cure weşanê bi zimanê xwe bike. Saziyên ragihandinê yên ku kurdan bi derfetên xwe pêk anîne, li Ewropayê jî nikarin zilm û terora dewleta tirk bifilitin. Ji hemû kes û saziyên ewropî daxwaza me ev e: Ji sedî dehê demokrasiya ku hûn ji bo xwe dixwazin, ji bo me jî bixwazin.

Înstîtuuya Kurdî ya Stenbolê: Hêzên împeryalist ên cihanê bi dagirkiran re dest dane hev û dibêjin: "Divê ji îro şûn de kurd nebîne xwediyê tu mafên mirovî. (...) Gelê kurd ku di welatê wî de dengê wî hatibû fetisandin û hemû hebûnên wî hatibûn peymalkirin, ji bo ku li sirgûnê nefesê bistîne û hawara xwe bigihîne mirovahiyê, bi xwîn û xwêdana xwe MED-TV afirand. Lê ev yek jî zêde hate ditin. Lê divê ev bizanin ku bê MED-TV jîyan li me heram e."

YRK: Dewleta tirk di terora li ser kurdan de tu sinoran nas nake. Ji mêj ve jî bo rê li ber weşana MED-TV bigirin, di serî terora sînyalê, her rêbaz hate ceribandî. Piştî weşana MED-TV'yê hate rawestandî, dewleta tirk ev yek wekî "serkeftina diplomatîk" bi nav kir. Ev yek jî nîşan dide ku bûyer ne hiqûqî lê siyasî ye. Dewleta tirk niha xebata girtina Özgür Politika û Ajansa DEM'ê gur kiriye. Dem hatiye êdî ku em bendekê deynin ber vê pêla terorê.

PS-KAWA: Li Ewropa ku xwe wekî kela azadiya weşan û çapemeniyê bi nav dike, dengê xurt e azadiya kurdan MED-TV hatiye birin. Ev bîrjar di bîngêha xwe de bîrjareke siyasî ye. Ev pêngava duyemîn a komploya Amerika ya li hemberî kurdan e.

KKP: Ev bîrjar polîtîk e, ku li dijî mafê me yê parastina zimanê zikmakî, çand û wergirtina nûçeyên rastîn e.

PSK: Bîrjara girtina MED-TV'yê ya bi hêla ITC'yê ve bi hinceta ku ev televîzyon propagandaya şer dike, piştî çalakiyên diplomatîk Tirkiyeyê yên li bal hinek dewletan hatiye girtin û bîrjareke siyasî ye. Em wekî PSK dixwazin ku ev êrişên li ser MED-TV'yê bi dawî bînin û ew ji nû ve dest bi weşana xwe bike.

MLKP: Bi bîrjara girtinê ya MED-TV'yê ku ji hêla împeryalistên îngilîz ve hate girtin, li êrişên ji bo tunekirina têkoşîna neteweyî ya kurdan yeke din zêde bû.

Komeleya Çandê ya Karkerên Koçber ên Tirkiyeyê: Dengê gelê kurd MED-TV li hemberî komploya navneteweyî pêjînkare tevgeriya. Wê, zilm û zora dewleta tirk, tevkujiyên ku wê li ser gelê kurd pêk anîne, li ber çavan raxist. Lewre çavên dewleta tirk bar nekir û zexta xwe ya li ser dewletên ku destûra weşana MED-TV'ya dane, zêdetir kir. Ev dê careke din bibînin ku dengê gelê kurd nayê birin. Em bang li hemû hêzên demokratîk û azadîxwaz dikin ku li MED-TV'yê xwedî derkevin.

Gotinên pêşyan û biwêj, kakilê zimên in

Biwêj zimên şayik dikin

Mirov dikare bibêje jina kurd wekî tûrikê parastina ziman û çanda kurdî ye. Jin wekî mêr, bi çanda serdestan re hevnas nebûye, lewre jiyana kurdan a xweser û çanda kurdan parastiye. Ev yek ji bo biwêjan jî derbas dibe. Jina kurd wekî kaniya biwêjan e.



Di biwêjan de zêde pend û hukum tune ye. Rûdan û bûyaran bi awayekî objektîf tînin zimên. Biwêj herî kêm ji du peyvên pêk tên. Di zimanê kurdî de hin biwêjên ku wekî peyvekê dixuyin jî di rastiyê de du peyv in. Bo nimûne, çavsor, pozbilind, zimandirêj, destdirêj... Ev peyv ji du hêmanên rêzimanî pêk tên. Mirov dikare biwêjên ji peyvekê pêk tên bike çar bir: a-ji navdêr û rengdêran b-ji navdêr û navdêran c-ji navdêr û lêkeran d-ji lêker û lêkeran pêk tên.

Navdêr-rengdêr

Çavsor: çav (navdêr) sor(rengdêr)

zikreş: zik (navdêr) reş(rengdêr)

çavreş: çav (navdêr) reş (rengdêr)

Navdêr-navdêr

Serkundir: ser(navdêr) kundir (navdêr)

Serdîl: ser (navdêr) dil (navdêr)

Devling...

Navdêr-lêker

Xwînmij: xwîn(navdêr) mij(lêker)

Kedxwir: ked (navdêr) xwir(lêker)

Kerxwir: ker (navdêr) xwir (lêker)

Lêker-lêker

Danûstandin: Dayin (lêker) standin (lêker)

Hin biwêjên ku ji bo qerf, nifir û çêran têne bikaranîn jî hene. Bo nimûne, zikzebeş, serkundir, sersîtil, porkur. Peyvin ku wateyên mecazî lê hatine barkirin jî he-

ne. Ev peyv digel wateya xwe ya rastîn bi wateya xwe ya mecazî jî têne bikaranîn. Mînak, kundir, kundirê mîranî, kuncî û hwd. Her wiha biwêjên ku di encama bûyerekê an jî çîrokekê de derketina holê jî hene. Bo nimûne: Mişk ji pisîkê re dibêje ji wê qulê derkeve têkeve wê qulê. Pisîk dibêje birayê mişk di vê daxwaza te de dek û dolabek heye. Pisîk dibêje, ez dixwazim bejn û bala te bibînim. Piştî ku mişk ji qulê derdikeve pisîk wî digire. Lewre jî ji vê rewşê re dibêjin "bazara mişk û pisîk."

Bi pêşketina teknoloji û zanîne re biwêjên têkildarî wan jî derketina holê. Zimanê kurdî jî di xwelêanîna (adaptasyon) pêşketinên navborî de her çiqas ketibe tengasiyê jî di dawiyê de bi ser ketiye. Bo nimûne: Telefon dan, telefon kirin, li televîzyonê temaşekirin, faks kişandin çend tîgînên bi ragihandinê re têkildar in. Di tirkî de ji bo telefonanê dibêjin "telefonla aramak." Di nav jiyana bajarî ya kurdan de qalibê tirkî tê bikaranîn. "Ez bi telefonê li filan kesî geriyam." Mînaka tirkîfikirinê di vir de li darî çavan e. Lê dema ku tu diçî Kurdistanê tu li mînaka navborî rast nayêyî. Lewre kurdîfikirin serdest e.

Di vê beşê emê li ser biwêjên ku di axaftina rojane de bi berfirehî têne bikaranîn û pêdivî bi wan heye, rawestî. Bi taybetî ji ku xwendevanên me baştir tîgîhêjin, dê di nava hevokan de bêne

nivîsandin û yên ku hemwateyên wan ên tirkî hene jî dê digel tirkîya wan bêne darîştin.

*Ker cendekê te nekişîne (eşek sudan gelene kadar dövmek)

Mînak: Elî wisa li Lezgîn xist ku "kerek cendekê wî nekişîne"

*Vizîna meşkê şil e

Mînak: Emîn dema dît ku "vizîna meşkê şil e" ji wir reviya.

*Wekî nal û bizmar in (Aralarında su sızıyor)

Mînak: Navbera Şêrgo û Cemîl pir baş e "wekî nal û bizmar in"

*Bi pirsê mirov diçe Xursê (Qersê) (Sora sora Bağdat bulunur)

Mînak: Ma tu yê navnîşanê çawa bikî "Bi pirsê mirov diçe Xursê"

*Mirin heye jîn heye (Gidipte gelmemek, dönüpte görmemek var.)

Mînak: Zozan, xwîşkê were em xatirê xwe ji hev bixwazin "mirin heye jîn heye"

*Bi ker nikare diavêje kurtanê

Mînak: Berfo "bi ker nikare diavêje kurtanê"

*Agir û pişo li cem hev nabe (A-teşle barut bir arada olmaz)

Mînak: Şiyar û Sîdar li hev nakin, ma "agir û pişo li cem hev dibin"

*Guhê dar û deviyana heye (Yerin

kulağı var)

Mînak: Kuro Rênas bistire "guhê dar û deviyana heye"

*Ez dibêjim nêr e dibêje bidoşe

Mînak: Keçê Zerê tu tiştên nebûyî dixwazî "ez dibêjim nêr e, tu dibêjî bidoşe"

*Ez bibim kevir (Anladıysam arap olayım)

Ji devê Gulê tiştêk nayê fêmkirin. Eger min ji devê wê tiştêk fêmkir, "ez bibim kevir"

*Aqil ji aqil zêdetir e (Akıl akıldan üstündür)

*Se, pê li dêla hev nakin (İt itin kuyruğuna basmaz)

Mîn: Her çiqas di navbera dagirkeran de nakokî hebe jî dema ku kurd têne rojevê, gişt dibin yek, "se pê li dêla hev nakin"

*Li ser dêla xwe ketin

Mîr: Serhad bi gef û gur bi ser min de hat, lê piştî tîgîhişt rastî ne wisan e "li ser dêla xwe ket"

*Aş çûye tu çeqçeqokê dipirsî (Atı alan Üsküdarı geçti)

Ji Leylayê wetrê emê herin geştê, ma havîn derbas nebû? "Aş çûye ew çeqçeqokê dipirse"

*Destê tenê deng jê nayê (Bir elin nesi var iki elin sesi var)
 *Dûvika derewan kurt e.
 Emîn bes derewan bike, "dûvikê derewan kurt e."
 *Kero nemire bihar e (Ölme eşeğim ölme)
 *Di guhê gê (gayî) de bûn (Dünyadan haberi olmamak)
 Egît ji te wetrê Serdar sax e, ma tu di "guhê gê (ga)" de yî. Ew ji zû de miriye.
 *Kuliya derziyê (İğne ucu kadar)
 *xweliyê biavêjî li erdê nakeve (İğneyi atsan yere deymez)
 *Pê li piya ketin (İğneyi atsan yere değmez)
 Kolana Ehmedê Xanî wisa qelebalix e "pê li piyan dikevin"
 *Kelemê çavan bûyin.
 Azad mîrekî jêhatî û çê ye. "kelemê çavê" dijmin û zikreşan e.
 *Dil hênikirin (Yüreğe su serpmek)
 Mizgîn ji ber mirina bavê xwe gelekî eşiya. Lê piştî ku bihîst diya wê ji aşîte filitiye hinekî "dilê wê hênik" bû.
 *Tala bêjingê (didik didik etmek)
 Mînak: Pirtûka min a çîrokan ji zû de ye wînda ye. Min her der kire "tala bêjingê" lê peyda nebû.
 *Bêjinga mîrate
 Mînak: Hêlîn û Zelal di nava şênî de mal bi mal digerin, bûne "bêjinga mîrate"

*Bêjinga qulqulî
 Mînak: Gokgirê Misircêsporê Hesen Pişê hingî gol xwarine, bûye "bêjinga qulqulî"
 *Darî çavan (göz önünde)
 Mînak: Halê Osman "darî çavan" e
 *Ling erdê negirtin
 Mînak: Mizgînê piştî ku bihîst kurê wê ji lehiyê filitiye, gelekî şa bû, ji şabûnê "lingê wê erd negirt"
 *Ba bin bask ketin (Sevinçten uçmak)
 *poz neşewitîn
 Kuro Mervan, te kincfiroş şêland, tu bi ser de jî pesnê xwe didî, qey pozê te neşewite.
 *Binê guh xwî nedan
 *Hîva bin ewr (Yerin dibine mi girdi)
 Ez ji sibehê vir de li saeta xwe digirim lê ez nabînim, ma bû "hîva bin ewr"
 *Mû ji mû qusandin
 Nûrî malxwêyekî destbela nîn e, qurîşekî jî dinirxîne, "mû ji mû diquşîne"
 *Mûyek jê şaş nekirin (fiş demiş burnundan düşmüş)
 Mînak: Şoreş gelekî dişibe xalê xwe "mûyek jê şaş nekiriye"
 *Kevirê kêvir ketî (Beterin beteri olmak)
 Mînak: Huseyn mirovekî pir zalim û dilgirs bû, lewre jî ahê xizan û rebenan jê re nema, bû "kevirê kêvir ketî"

*Bazara mişk û pisîk
 Ji tirsê li qulka mişkan gerîn (Korkudan kaçacak delik aramak)
 Mînak: Leşker dema çav bi gerîla ketin ji tirsê li qula mişkan geriyan.
 *Ji destê hev revandin
 Mînak: Romana Tolstoy a bi navê Şer û Aşîti romaneke gelekî hêja ye lewre jî "ji destê hev tê revandin."
 *Destê xwe jê şuştin (Elini ayağımı çekmek)
 Mînak: Tasawûfkar ji kar û barên dinyayê "destê xwe dişon" tim û daîm îbadet dikin.
 *Parçeyê mezin guh mayîn
 Mînak: Di encama teqîna bombeyê de leşker parçe parçe bûbû, parçeyê wê yê mezin guhê wî mabû.
 *Bi qesta êlê çûna sêlê (Dibe ku 'bi qesta sêlê çûna êlê' be)
 Kesek bi qesta ku li nav şênîyê êlê bigere sêlê dike hincet.
 *Av kolandin (Havanda su dövmek)
 Zana, ev hewldana te naçe sêrî, tu avê dikolî.
 *Telefon dan
 Biwêja bi rengê "Bi telefonê gerîn" çewt e, rasterast ji tirkî werger e. Li şûna wê di kurdî de "telefon dan" tê bikaranîn. Salih telefon da Şêrgo.
 *Ne dan ne standin
 Mînak: Mervan kêliya di zinêr de hate xarê, "ne da ne stand."
 *Berde binê te erd e (At, arazi bol)
 *Dana ber dil (gönlünü almak)

Mînak: Xezalê piştî ev bûyera bêyûm bihîst gelekî xeyidî, kelogirî bû, ji bo negirî min da ber dilê wê.
 *Di ber dil re çûn
 *Avêtina ber hev (atışmak)
 Mînak: Şevbuhêrk gelekî baş derbas bû, dengbêjan hetanî berbangê avêtin ber hev.
 *Aşê hewarê
 Mînak: Farqîn wekî "aşê hewarê" bi şev û roj dixwe û "dikayê"
 *Qidûmşikestin
 Mînak: Delalê piştî ku mirina diya xwe bihîst "qidûmşikestî" bû.
 *Dest ji erd û ezman qetîn
 Mînak: Bi bihîstina rûdana bêyûm re destê min ji erd û ezman qetiya.
 *Av lê venexwarin
 Mînak: Mazlûm dema keysa xwe lê tîne, dest bi qerfan dike, "avê lê venaxwe."
 *Revandina nexweşxaneyê
 Piştî ku nexweşîna Xalê Osman giran bû, ew revandin nexweşxaneyê.
 *Bi tayê ketin (Bir şeyin derdine düşmek)
 Şevîn kete taya peydakirin diravan.
 *Li keysa xwe gerîn (Fırsat kollamak)
 Mînak: Bêrîtan li keysa xwe digere ku dorê li min teng bike.
 *Kî bûk e tu berbû yî (her şeye maydanozolmak)
 (Qediya)

MEMED SERHEDÎ

MED-TV jî ...

NEJDET BULDAN



E-Mail: Buldan@compuserve.com

Hemû êrîş û qedexekirin li ser kurdan tîr ceribandin. Dîrok dinivîse, tê gotin ku di demên kevn de ûrisan çekên xwe yên nû li ser kurdan ceribandine. Niha jî ewrûpî zagonên xwe yên qedexekirinê li ser dezgeh û sazîyên kurdan diceribînin.

Belê televîzyona dengê azadiyê MED-TV ji bo çend rojan hate girtin. Li gorî zagona wan ITC (Komîsyona Serbixwe ya Televîzyonê) di navbera bîst û yek rojan de encama weşanên televîzyonê dê zelaltir bibe. Gelo ka dê weşanên xwe bidomîne an jî seranser bête qedexekirin. Gumanek heye ku televîzyona kurdî bi cezayê diravan jî bête cezakirin. Lê hemû kes û sazî dizanin ku ev biryar ne hiqûqî ye, siyasî ye. Ji ber ku ew biryar li ser daxwaza ewrûpiyan nehatiye girtin. Li ser daxwaza dijminê herî mezin dewleta tirk ev biryar hatiye girtin. Dewleta tirk a ku naxwaze tu sazîyên serbixwe yên kurdan

li tu deverê hebin, rengê xwe yê reş eşkera kir. Mîna berî niha demeke gelekî kevn, wê demê jî dewleta tirk tîkiliyên xwe û yên dewleta Misirê aloz kiribûn. Ji ber di dema Cemal Ebdulnasir*de radyoyekê bi zimanê kurdî weşana xwe dikir. Paşê, salên çûyî Radyoya Dengê Amerîkayê (VOA) dest bi weşana xwe ya bi kurdî kir. Tirkan dîsa nerazîbûna xwe eşkera kir. Lê belê dewleta Amerîkayê guh neda Dewleta Tirk. Ev ne bûyerên nû ne, dîrok her dem xwe nû dike.

Lê pêwîst e ku kurd gelek xemgîn nebin. Ligel hemû êrîş û astengiyên hêzên neteweyî û sazîyên neteweyî hatine pêkanîn. Berê dengê kurdan ji nav keviran, li serê çiyayên Kurdistanê dihat. Radyoyên kurdan bangê xwe ligel hemû sînyal û astengiyên teknîkî bilind dikir. Şerê çekdarî li hemberî hemû hêz û quwetên NATO'yê yên hovane û nijadperest dimeşe. Berê navê kurdan tunebû. Niha gelek sazîyên navneteweyî li ser çareserkirina Pirsgerînga Kurd disekin. Gelê kurd hemû sazîyên xwe bi xwîna şehîdan ava kiriye. Teknîk û zagonên demê nikarin bibin asteng, li pêşîya pêşveçûnê. Hişyarbûn û tîgihîştîneke wisa çêbûye ku kurdayetî mîna asreke mezin hemû astengan diherîşîne.

Em hîni gelek tiştan bûne. Dibe ku asten-

giyên rojane hinek xebatên me bi awayekî rojane rawestînin. Lê bila kes hêviya sekinîna domdar neke. Hemû nîrx û sazîyên ku bi xwîn û giranbuhayî hatine damerizandin, bi erzanî nayên hêlan. Televîzyon, pêwîstiya wê jî hatiye zanîn. Ew tiştê ku dijmin zêde jê bîrtir jî mîna av û xwarinê ye. Ev dezgeh bi destê dijminan, bi îcaza wan nehatiye çekirin, bi tîkoşîna gelê kurd, bi harîkariya welatparêzî û zanîneke hemdemî dengê azadiyê nehatiye birîn. Mîna girtina birêz Öcalan, ma kurdan bi girtina wî dest ji tîkoşînê kişand? Pêwîst e ku bê zanîn, bê astengî tu şoreş bi ser nakevin û bê MED-TV jî nameşe. Me qêdera xwe ya bindestiyê guhartiye. Girîngiya vê şoreşê ji asteng û êrîşên li dijî wê eşkera ye.

* Gotûbêja di navbera rayedarê dewleta tirk a wê demê û Cemal Ebdulnasir de jî gelek balkêş e. Li gorî gotina Serokê YNK Celal Talabanî, dewleta tirk rayedarêkî xwe ji bo vê yekê dişîne Misirê. Di hevdişînê de rayedarê tirk mijarê vedike, lê Cemal Ebdulnasir bi konetî dipirse, dibêje: "Gelo, li welatê we kesekî ku bi zimanê kurdî qise dike heye?" Rayedarê tirk dibêje: "Na." Li ser vê yekê dibêje: "Nexwe tiştêkî ku hûn jê bixeyidin li holê tune ye."

Nameya Serpil Polat bo malbat û hevîrêyan wê DA KU KES XWE NEŞEWITINE...!

Serpil Polat ji doza Yekîtiya Marksîst-Lenînîst ya Propagandaya Çekdarî (MLSPB) di girtîgehê de bû. Wê, roja 17 Reşemiyê ji bo komploya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê agir berda canê xwe û jiyana xwe ji dest da.

Ji bo gelên me û malbata min...

Ez zêde dirêj nakim. Hêvîdar im hûn ji ber vê yekê hêrs nabin. Ez dixwazim bi tenê vê yekê vebêjim: Bi serbilindîya şervana şerê gel a mafdar û rewa, ku wê teqez bi ser bikeve, bi dilçûşî silavê li we hildidim. Ez dê bi dilçûşîya vê serbilindîyê, kela dilê xwe di serê dijmin de teqînim.

Divê em împeryalîzm û olîgarşiya Tirkîyeyê di xwîna ku rijandîyê de bifetîsin. Min divê, di vê meşa ku ji bo gelan hatiye lidarxistinê de, helwesteke bêdudilî û tund wergirim. Her û her em bi hev re ne. Em ji hev venaqetin, beravajî wê em digihêjin hev. DGM'yên olîgarşiya Tirkîyeyê û hêzên împeryalîst nikarin îradeya şoreşgerî mehkeme bikin. Îradeya şoreşgerî radest nabe.


Li ser bingeha vê rastîyê, ji ber kêmbûna derfetên warê ku ez tê de me, ez wekî navgîna êrîşkariyê, ez navgîna ne 'xweşewitandinê' navgîna 'dijmin şewitandinê' bi kar tînim. Hêvîdar im hûn ji ber vê yekê dilê xwe nagirin. Hezîkirina min ya bo we gelekî mezin e. Ez bawer im hûn dê daxwaza min ya bo hevaltiyê qebûl bikin. Ez tîmê destên dê û bavê xwe. Ez we bi germahiya êgir û rojê silav dikim û xwe li we wer tînim. Qet xeman nexwin.

Wekî min got em ji hev venaqetin, beravajî wê em digihêjin hev. Cihê jivana (buluşma) me û we, cihê jivana me û laşên hûr ên xebatkar, karkerên Petkîmê ku her li ber mirîne ne ye. Ev cihê jivana me û şerê gerilayên Kurdistanê yê rizgarîxwaz û şoreşgerên cihanê û şehîdên şoreşê ye. Em dê hîna gelek caran werin jivana hev. Li serê çiyayê, war û kolanan, şer û barîkatan û cara dawîn jî li jiyana nû ku mirovê nû tîne pê, em dê li stranên serkeftinê werin jivana hev.

Ji dêvla ku em êgir berdin canê xwe, divê em şer gur û geş bikin, da ku meşa bo serfetinê biçê serî.

Ez dixwazim dostên PKK'yî vê çalakiya min wisa fêhm bikin: Ez ji bo pêkneanîna çalakiyên xweşewitandinê vê çalakiyê pêk tînim. Ez bi hêviya ku xurtkirina hevgirtina şoreşgerî li hemûyan silavê hildidim.

Şoreş bi gelerîbûnê (halklaşma) dê bi ser bikeve. Erk û rola pêşewayên şoreşger girîng û bêhempa ye. Pêşewayê şoreşger Abdullah Öcalan dê bi vî zanabûnê



tevbigere û divê bi vî awayî tevbigere. Di serdemên ku pêşawa tîne kuştin an jî ji xetê tîne awarê kirin de, pêşawayên nû peyda bûne û dê peyda bibin. Şer û jiyana wê bi her awayî bê nixandî û paşê jî meş dê berdeyam bike.

- Silav li hemû kedkarên cihanê!
- Bimre Faşîzm Bijî Têkoşîna Me!

- Bijî Şerê Polîtîk yê Leşkerî
- Bijî Yekîtiya Marksîst-Lenînîst ya Propagandaya Çekdarî!

Serpil Polat / 17. 2. 1999

Ji sorahiya berbangên ku neyên darizandin parçeyekî bidin min û li serê çiyayê hilreşînin. Min ji kaniyên zozanan qurtek av divê. Li kolanan ji bişîrîna zarokan, ji germahiya dilê Dayikên Şemiyê, ji giranbihayiya hevîrêyan û ji konên grevan germahiya ku dikeve para min li min vegeînin. Ez dixwazim bibim şervana Şerê Pêşeng ya ku Hevkêşeya Derewîn hildiweşîne.

Ji bo hevîrêyan: Dengê xwe rakin

Berî ku ez li nava êgir silavê li we hildim, bi germahiya pêvajoyê, dilçûşîya meşa bo serkeftinê û bi rewşa me ya ku bêkêmanî çûye serî, dixwazim hûn dengê xwe rakin. Ji we hemûyan re di nava "Şerê Pêşengî (Öncü Şavaşı)" de jiyana û serpêhatiyên tîr geş dixwazim.

Dengê min bi tîra xwe ne xurt e. Ji ber ku ez ne li hêviya wan rojan im ku, li serê çiyayê di nava yekîneyeke gerîla de ref bigirim. Her wiha ez ne li hêviya van tiştan im: Li qad û waran bi dijmin re

şer kirin, tevî çîna karkeran û febrîkayan li qadan strandin û ez ne li hêviyê me ku, di nava Şerê Polîtîk ya Leşkerî de cih bigirim, ku wê hevîrêtiya ligel Hevrê Mahir xurt bike. Ev helwest û rewş di nava xwe de nakok û nelihev e. Lê dema em li helwesta beramberî êrîşên li dijî pêşawayên şoreşgerî dinîhêrin, helwesta birûmet a li Kızıldere ya beramberî rewşa Deniz, Hüseyin û Yusuf wekî destaneke berxwedanê bo me dibe mînak.

Ez nakim yek, min maf jî nîn e. Lê di mercên ku em tê de ne de, ev yek rîyeke

agirîn e, ji bo şewitandin û lêvegerandina dijmin.

Hêvîdar im hûn dê min fêhm bikin û hembêza xwe ji min re vekin. Di vê dema ku em ji dil û can li serkeftinê sor bûne, ez jî dixwazim ala "Rizgarîya Şoreşger" hildim. Ji sorahiya berbangên ku neyên darizandin parçeyekî bidin min û li serê çiyayê hilreşînin. Ji kaniyên zozanan qurtek av bidin min. Li kolanan ji bişîrîna zarokan, ji germahiya dilê Dayikên Şemiyê, ji hêjahiya hevîrêyan û ji konên grevan germahiya ku dikeve para min, li min vegeînin. Ez dixwazim bibim şervana Şerê Pêşeng ya ku hevîrêşeya derewîn (Suni denge) hildiweşîne. Her tim, dema min xwest di xeta Partî-Cephe de bimeşim, mezinahiya nasnameya rêxistinî bû bersiv. Wekî berendama şervana Yekîtiya Marksîst-Lenînîst a Propagandaya Çekdarî, min mafê endamtiyê heq nekiriye. Ez êrîşên ku di şexsê pêşawayê şoreşger Abdullah Öcalan de bi giştî li dijî gelan û bi taybetî jî li dijî gelê kurd tîne meşandin, şermezar dikim û dibêjim pêşawayê şoreşger Abdullah Öcalan nayê darizandin. Ez kela dilê xwe bi rivîna laşê xwe di ser dijmin de vedirîsim.

Hevrêno! Min nekarî ziman û rêbaza xwe vegotinê peyda bikim. Lê ji dil û can pê bawer im ku hûn dê min fêhm bikin. Ez careke din we û hemû dostên şoreşger ji dil û can silav dikim...!

- Pêşewayên Şoreşger Nayên Darizandin!

- Divê Serokê Giştî yê PKK Serbest bê Berdan!

- Bimre Olîgarşî, Bijî Şerê Şoreşger ê Rizgarîxwaz!

- Bimre împeryalîzm

- Bimre Faşîzm, Bijî Têkoşîna Me!


- Bijî Yekîtiya Marksîst-Lenînîst a Propagandaya Çekdarî!

□ 28 adar 1986:

Mahsum Korkmaz (Egîd) şehîd ket

Serleşkerê Hêzên Rizgariya Kurdistan HRK'ê Mahsum Korkmaz (Egîd) di serê Çiyavê Gabarê de şehîd ket. Mahsum Korkmaz ji Farqînê ye lê malbata wî jî zû ve li Êlihê niştêhî bûye. Egîd li Êlihê li hember reformîst, sovenîst û îxanetê ser kir, her wina gelek kes birêxistin kirin. Çû Lubnanê û beşdarî perwerdehiya leşkerî bû. Di amadekirin û pêngava 15'ê gelawêjê de keçeke wî ya mezîn heye.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 30 adar 1972:

Mahir Çayan û hevalên wî hatin kuştin

Li Tirkiyeyê xwendekarên zanîngehan di lêkoşîna li dijî dewleta tirk a di salên 1970'vî de, 3-4 rêxistinên veşartî ava kirin. THKP/C bû yek ji wan rêxistinên bû. Serokê wê rêxistinê Mahir Çayan bû. Piştî ji Girtîgeha Maltepeyê reviya tevî hevalên xwe li Tokatê dest bi amadekirina şerê çekdarî kir. Piştî girtina Deniz Gezmiş û hevalên wî jî bo ku rê li ber dardekirina wan bigirin, Mahir Çayan tevî hevalên xwe çend teknîsyanên Îngîlîz revandin, lê li Kızılderewê ew û 3 teknîsyanên Îngîlîz jî aliyê dewleta tirk ve hatin kuştin.

Henrmendekî din ê kurd li derveyî welêt jiyana xwe ji dest da

Qadir Dîlan wefat kir

"Ehmedê Xanî eger Mem û Zîn di nav neteweyekî din de binivîsanda wê bi bûya filozofekî navdar. Pêwîst e rewşenbîrên kurd, Mem û Zîn bixwînin. Eger temênê min têr bike ezê Mem û Zîn bikim operayeke mezin."



Hunermendê Kurd ê bi nav û deng Qadir Dîlan hefteya derbasbûyî li paytexta Komara Çek Pragê wefat kir. Qadir Dîlan 71 salî û Serokê Yekîtiya Hunermendên Kurdistanê bû. Dîlan 35 salên xwe yên dawî li derveyî welêt derbas kiribûn. Lê belê di dilê wî de her tim evîna Kurd û Kurdistanê hebû.

'Şoreşa dawî tesîreke mezin li ser min çêkir'

Qadir Dîlan hunermendekî jî bajarê Silêmaniye bû. Zarokatiya xwe li Silêmaniye derbas kir û kurdeyatiya xwe li wî bajarî nas kiribû. Dîlan eleqeyek mezin ji Tekoşîna Rizgariya Kurdistanê re nîşan dida û di her fîrsetê de digot: "Ezê stranên vê şoreşê çêbikim."

Dîlan di nava 71 salan de gelek kar kir. Ji aliyê ve li ser muzîkê xwe bi pêş ve dibir, ji aliyê din ve jî, tevî tevgerên kurdî dibû.

Qadir Dîlan, dixwest li ser dîroka hunera kurdî hûr bibe. Pêwîst e mirov bibêje hunermendê me di wî warî de gelek lêkolîn çêkin. Daxwaza wî ya herî mezin ew bû ku operaya Mem û Zînê çêbibe. Dîlan, vê daxwaza xwe bi van gotinan diyar dike: "Ehmedê Xanî eger Mem û Zîn di nav neteweyekî din de binivîsanda, dê bibûya

filozofekî navdar. Pêwîst e rewşenbîrên kurd, Mem û Zînê bixwînin. Di vê berhemê de kokên kurdayatiyê veşartî ne. Eger temênê min têr bike, ezê Mem û Zînê bikim operayeke mezin."

Qadir Dîlan di salên 1950'yî de nav da. Bi taybetî li her derê başûrê Kurdistanê besteyên wî û dengê wî dihat bihîstin. Qadir Dîlan di hevpeyvineke xwe de li ser jiyana xwe van agahiyan di-de me: "Bi eslê xwe ez ji Silêmaniye me. Di nav malbateke hunermend de min çavên xwe vekirin. Ji biçûkahiya xwe ve ez eleqeyeke mezin ji bo muzîkê nîşan didim. Ez çûm dibistan û akademiyên muzîkê. Min di sala 1952'yan de li Baxdayê serokîtiya Radyoya Neteweyî ya Iraqê kir. Min ev kar heta sala 1955'an berdewam kir. Pişt re ez vegeriyam Silêmaniye. Min di Radyoya Silêmaniye de xebatên muzîkê çêkir. Di wan salan de jî bo xizmeta muzîka kurdî bû. Di sala 1957'an ez derbasî Pragê bûm. Armanca min li ser muzîka kurdî hûrbûn bû."

Li gorî Qadir Dîlan muzîk jiyana e, ji bo kurdan hestên neteweyî ye. Dîlan, ji bo pêşerojê gelek tişt hiştin û hêja çû.

PERWER BENGÎ

ÇAVDÊRÎ



Rojava bi Sedam tawanbar e li Helebçe

MÎRHEM YÎÇIT

Peyman û lihevkirinên navneteweyî bikaranîna çekên kîmyewî qedexe kirine. Ev qedexeyî ev 74 sal in ku heye.

Ji sala 1925'an û bi vir de di van 74 salên buhurî de li vir û li dera han dewletên ku ev qedexeyî nas nekerine hatine dîtin. Wek nimûne belge û lêkolînen li ser çekên kîmyewî, biyolojîk û nukleer dinivîsin ku Amerikayê di salên 1951 û 52'yan de ev çek li Koreyê û piştî sala 1961'ê li Vietnamê bi kar anîne. Hinekî bi mînaqêşê be jî şiklek heye ku Îsraîl bi xwe jî sala damezirandina xwe, angî sala ku bûye dewlet li dijî ereban çekê kîmyewî bi kar anîne û ew jî ne bêriye di vî alî de.

Li gorî lêkolînerên kurd (Dr. Çeladet Çeliker) welatê ku ji her welatekî din zêdetir bûye hedef ji jehir, rivîn û bombeyên kîmyewî re Kurdistan e. Di destpêka sedsalê de cara ewil Îngîlîz vê çekê li Kurdistanê rast dikin û didin ber bombeyên kîmyewî. Her wiha dagirkerên tirk di salên 1930'î de li dijî serhildêrên kurdan dest diavêjin vê çekê. Di nav dagirkerên Kurdistanê de Iraq jî sala 1963'yan û pê de napalmê daveje Kurdistanê û çekên qedexê bi kar tîne. Herçendî Iraq bi xwe jî peyman qedexehiya çekên kîmyewî piştî qedexehiya wan bi şeş salan (1931) îmze kiriye jî, di dîroka xwe de vê dewletê di sê periyodan de angî salên nav 1966-1969, saa 1974 û ya 1988'an herî zêde bi kar anîne.

Divê bê gotin ku heta sala 1991'ê Iraq di meseleya çekên kîmyewî û febrîkeyên jehrawî de piştî Amerika û Rûsya hêza sêhemîn bû.

Li vir tiştê hêjayî gotin û baldariyê ew e ku Iraqê giş febrîkeyên xwe yên çekên kîmyewî bi alîkariya şîretên rojavayî ava kirin û agahdar bûn li ser bikaranîna van çekên li dijî kurdan. Çend nimûne:

1. Mesele adara 1984'an heyeteke Neteweyên Yekbûyî tesdîq dîke ku Iraqê di şerê li dijî Îranê û kurdan de çekên kîmyewî bi kar anîne. 2. Sala 1986'an televîzyona BBC programekê amade dîke û tê de bi berfirehî behsa kapasîteya çekên kîmyewî li Iraqê dîke û agahiveke fireh dide. 3. Serokên CIA yên mîna H. Webster di şeş xalên sereke de alîkariya rojava jî bo Iraqê dihejmêre û dibêje ku Iraq bi serê xwe qet ne mimkûn bû karibe bibûya ev hêza dirinde û jiserweçûyî.

Di ser kîmyebarankirina Helebçe re 11 sal derbas dibin. Ecêb e ku îsal ne li Ewropa û ne jî li dereke din kesî behsa vê jenosîdê kir. Bi tenê li ser sekinîn û bi taybetî MED-TV'yê cihêkî mezin da vê bûyerê. Helebçe trajediyek e, trajediyek mezin û xweser e. Xweserî ne di kuştina girseyî ya 5000 kurd û du ewqas jî birîndar de ye. Di wê de ye ku niha jî piştî ewqas sal buhurîne hê jî jî ber tesîra jehrên kîmyewî mirovên kurd dimirin. Zêde kes bi vî aliyê meseleyê nizane û kes serê xwe pê re naêşîne. Heta Ewropa jî Sedam jî zêdetir dixwaze ku ev roj jî bîra bibe.

Rast e biryara kîmyebarankirina Helebçe Sedam da. Balafir û pilotên Iraqî ev bobelat anîn serê gelê me. Tiştê dewleta Iraqê kir ji faşîzmê jî xerabtir e. Kurd çendî vê dewletê tawanbar bikin, çendî lanetê lê bibarînin hindik e. Em jî îro vê dikin û divê berdewam jî em vê bikin.

Lê protestokirina me heger bi tenê bi Iraq bête sînokirin dê tê de kêmanî hebe, dê rastî nîvrê bimîne. Em divê her sal dema ku em vê rojê bi bîr tînin, divê em qet pişk û rola şîretên alman, amerîkî û giş dewletên Rojava jî bîra nekin.

Li paş her trajedî û komployeke sedsala 20'an li welatê me jî sedî sed çend dewletên împeryalist û kolonyalist jî hene. Ev divê tim û tim di bîr û bala me de be û em vê jî cil û nişên xort û zaro re bêjin.


Sersaxî

Dayika Endama Kargerîya NCM'ê û listîkvana Teatra Jiyana Nû Yıldız Gültekin Şadime Gültekin Xanim, di 18'ê adara 1999'an de çû ser dilovaniya xwe. Em ji malbata Gültekin û nas û dostên wê re sersaxiyê dixwazin û dibêjin rehma Xwedê li Şadime Xanimê be...

HUNERMENDÊN NAVENDA ÇANDA
MEZOPOTAMYA YÊN TEATRA JIYANA NÛ



■ Li her çar aliyên cihanê, kurdên ji her çar parçeyên Kurdistanê û dostên wan li hev kom bûn û bi coşî Newroz pîroz kirin. Yek ji wan pîrozbahiyên ji li bajarê Almanya Berlinê li dar ket. Kurdan di van çalakiyan de, sloganên wekî "Bijî Serok Apo", "Terorîst Tirkiye" "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok" û hwd. qîriyan.



Di serî de li hemû parçeyên Kurdistanê pîrozkirin. Bi taybetî ligel êrîşên...

Agire serhildane

Waliyê OHAL'ê berî Newrozê gotibû: "îsal pêjna serhildanê tê". Gotinên wî bi çalakiyên Kurdistanîyan ên bo Newrozê hatin çespendin. Kurdistanîyan di van çalakiyan de "generalên biçûk" lê "generalên biçûk" kevir 'diyarî' wan kirin. Polîsan li hin deveran zarok jî dane ber copan. Li aliyê din gelek siyasî...

KURDISTAN-BAKUR

AMED:

Wekî tê zanîn Waliyê OHAL'ê Aydın Arslan berî Newrozê diyar kiribû ku, îsal pêjna serhildanê tê lewre jî ew dê rê nedin tu çavdêran û wan bo vê yekê amadehiya xwe pêk anîye. Ligel vê yekê û qedexebûna pîrozkirina Newrozê, li serbajarê Kurdistanê li gelek cihên bajêr Newroz hate pîrozkirin.

Li Amedê çalakiyên bo Newrozê şeva 21 adarê dest pê kir. Li navçeyên wekî Kantar, Îskanevlerî, Sento, Batîkent, Seyrantepe, Şehitlik, Bağlar û Huzurevleran beşdaran agirê Newrozê dada û govend girt.

Li navçeya Huzurevlerê polîsan êrîşî girseyê kir. Beramberî vê yekê zarokan polîs dane ber keviran. Li ser raperîn û dilcoşiya gel Gerîndeyê Ewlekariyê yê Amedê Gaffar Okan gef li gel xwar û got: "Ku we li ku 10 kes ligel hev dîtin, yekser hildin binçav." Wekî din Parêzgarê Amedê Nafiz Kayalı jî bi riya weşana yekser di Söz-TV'yê de axivî û got: "Ên ku beşdarî çalakiyan bin, wê bi dijberiya qanûna xwepêşandan û meşan bêne darizandin."

Li aliyê din Platforma Demokrasiyê ya Amedê jî ragihand ku divê Newroz li gorî rastiya wê were pîrozkirin û wekî cih jî Batîkent hate destnîşankirin. Li ser vê yekê rayerdar û leşker li hev rûniştin û li dijî pîrozbahiyên bergiriyên xwe pêk anîn û dor li

bajêr hate girtin.

Piştî ku diyar bû wê Newroz li Batîkentê were pîrozkirin, jendermeyên bi mertal li derdora Batîkentê hatin bicihkirin û hemû kolanên navçeyê hatin rapêçandin. Bi vî awayî bo pîrozbahiyê rê nedane gel. Piştî van bergiriyên Gerîndeyê Ewlekariyê Gaffar Okan ligel çapemeniyê hate warê pîrozbahiyê û got ku ji ber Newrozê şeniya bajêr bêhnfireh û bextewar e.

Her wiha li cihên wekî Doktorlar Sitesi, Kuruçeşme, Sanayi Mahallesi, Emek Caddesi, Cengizler Caddesi, Alipaşa Mahallesi, Gürsel Caddesi, Bayramoğlu Sitesi, Mardin Kapı, Benûsen, Yunus Emre Mahallesi, Ali Pınar gel li hev civiyên agir dada û dîlan gerand. Li Emek Caddesi û Şehitlik polîsan êrîşî ser girseyê kir û zarokan jî polîs dane ber keviran.

Li aliyê din li navçeyên Bağlaran gel ala tendirustxaneyê (sağlık ocağı) danî û dîlan gerand. Her wiha li Deriyên Mêrdîn û Rihayê çalakdaran li ser Sûrên Amedê agir dada û govend gerand. Wekî din li navçeyên Amedê Farqîn û Bismilê jî Newroz hate pîrozkirin.

Dîsa roja 23 adarê nêzîkî 300 xwendekar li Zanîngeha Dicleyê li kafeteryayê li hev kom bûn, slogan hildan piştê jî cam û sandalyayên kafeteryayê şkenandin. Wekî din Serokê Giştî yê Partiya Kedê (EMEP) Levent Tüzel û koma ligel wî, ku xwest bo xebatên hilbijartinê biçe Amedê jî aliyê polîsan ve hate astengkirin.

Li pey agahiyan di dema Newrozê de za-

rok û jin jî di nav de li dora 4 hezar mirov hatine binçavkirin.

RIHA

Li Riha û navçeyên wê beşdaria bo çalakiyên Newrozê tevî astengiyên dijwar jî geş û berfireh bû. Li Taxa Eyyûbiyê gel tevî dahol û zîrnayê govend gerand û strand.

Her wiha bi pey ragihandina li navçeya Pirsûsê (Suruç) nêzîkî 200 girse li hev kom bûye. Peyre polîsan êrîşî biriyê ser girseyê û gelek kes binçav kirine. Wekî din li Serê Kanîyê jî Newroz hatiye pîrozkirin.

WAN

Ji ber Newrozê li Wanê jî li kolan û kuçeyên bajêr panzer hatin bicihkirin. Çalakiyan pêşîn li Zanîngeha Yüzüncüyıl rû da. Peyre jî li Taxa Hacibekir li şêş cihên cihê agir hate dadan. Li navenda bajêr jî çar erebeyên li ser alîgirên MHP'ê û lastîkxaneyek hate sotin. Her wiha li pey ragihandinê bombeke dengdêr (ses bombası) li Kargeha Bacê hatiye avêtin lê neteqiyaye.

Her wiha li taxên Karşıyaka, Abdurrahman Gazî, Taxa Yeni, Erek, Cevdet Paşa, Kümevler, Üçevler, Seyit Fehim Arvasi, Şabanîye, Akköprü, Yüniplik, Şamranaltı, Selimbey û navçeya Bostaniçi gel bi girseyî Newroz pîroz kir. Hate ragihandin ku li Taxa Hatuniyê gel du trêmbelên polîsan rûxandine. Wekî din li pey agahiyan li Taxa Erek kesekî agir berdaye canê xwe.

Dîsa bi pey agahiyan gel avêtiya ser mala kesekî, ku xwestiye pîrozbahiya Newrozê asteng bike û camên malê anîne xwarê. We-

kî din li Taxa Xaçortê jî gel birayê taxê Cemil Çavur, ji bo ku gel gulekariye, ricimandiye.


BATMAN

Li hemû taxên Batmanê ligel bawar jî çalakî li dar ketin. Şev û êvar adarê li Taxên Beşevler, Hilal, Petrol Kültür, Yeşiltepe, 19 Mayıs, İpragaz şiyaka Newroz hate pîrozkirin û şev wekî "Bi can bixwîn em bi te re ey" "Bijî Serok Apo", "Newroz pîroz beşevler, Bakur, Rojhilat Apo Serokê Welatî hildan. Piştî çalakiyan polîsan gelek malan, li gel da û gelek kes hatin binçavkirin. Li hin deveran polîs jî berî tengasiyê gulê berdand hewayê. Her wê trêmbelên hilbijartinê yê CHP û MHP bo propagandayê li nav taxan digeriyên ber keviran.

Li aliyê din li navçeya Batmanê ligel gef û çavtirsandinên leşkeran jî zêde li hemû tax û gundên Hezoyê hate pîrozkirin. Li Hezoyê di nav de berên HADEP'ê nêzîkî 20 kes hatin binçavkirin.

ŞERÎT

Ji ber ku Serokê Giştî yê ANAP'ê Yılmaz bo pîrozkirina Newrozê çalakiya bala raya giştî li ser vî bajarî bû. Yılmaz ja 19'ê adarê bo Newrozê mîfîngê kir xist. Ji bo vê mîfîngê gelek kes bi dîtin li qada mîfîngê hatin civandin. Di dema girseyê ku ji 200 kesan pêk dihat, ganên "Bijî Serok Apo" û "Bi xwînê...



Her çar aliyên cihînanê Newroz hate li metropolan gel Newroz pîroz kir.

■ Bi pey ragihandina İHD'ê li Newrozê di warê binçavkirinê de Tirkîye li rekoran boriye û 8174 kes hatine binçavkirin. Sekreterê Giştî yê İHD'yê Hüsni Öndül helwesta polîsan şermazar kir û got: "Zarokên pênc salî jî şideta polîsan para xwe stand."



İHD'ê metropolan

stanê çî li Tirkîyeyê tevî astengên dijwar û berfireh jî, bi çalakîyên cur bi cur hêzên Tirkîyeyê tengzar kirin. Lewre rayedarên dewletê an gef li gel xwarîrkerên bo 'Nevrûzê' çûn Kurdistanê. Lê gel rûyê xwe jê bada. Bo nimûne li mifînga Mesut Yılmaz a li Sêrtê gel sloganên wekî "Bijî Serok Apo" qîriyan.

em bi te re ey Serok" hildan. Li pey polîs û tîmên taybet bi dar û qalasan berê xwe dan girseyê û 40 kes jê binçavkirin.

Li layê din li taxên Çakmak, Conkbayır, Ulus, Dumlupınar, Çal, Şel Pompa Altı, Yeni û Alan gel li hev kom bû û ligel agir û dîlanê Newroz pîroz kir. Piştî çalakîyan polîsan avêt ser malan û gelek kes hatin binçavkirin. Li Taxa Çakmakê dema gulebarandina polîsan de 4 kesên ku birîndar bûbûn, piştî bo nexweşxaneyê hatin guheztin hatin binçavkirin.

Wekî din li navçeyê Sêrtê Misirce û Xana Hewêl (Baykan) jî gel Newroz pîroz kir. Her wiha gel, li gundê Siya (Bağlıca) çû ser gora Sema Alp û Newroz pîroz kir. Wekî tê zanîn Sema Alp li Berlînê li ber Konsolosxaneyê İsrailê hatibû kuştin.

Li Mêrdînê pîrozbahiyên bi coş û geş û dest pê kir. Li çar aliyê bajêr agir her geş bû. Gel di dema çalakîyan de sloganên "Bijî Öcalan", "Bijî Newroz" hilda. Polîsan ji bo ku rê li ber çalakîyan bigirin di nav de gelek zarok, rêveberên HADEP'ê û gelek kesên din binçav kirin.

Li navçeya Nisêbinê jî agirên ku hatibûn dadan li dermedora navçeyê geş bû.

* Her wiha li Kurdistanê li bajarên Semsûr, Meletî, Çolemerg, Xarpêt, Dîlûk, Şirnex, Agirî, Îdir, Bilîsê Newroz hate pîrozkirin. Bi tenê li bajarê Meletiyê pîrozbahîya Newroz bi awayekî fermî li dar ket.

NAVENDA NÜÇEYAN

TIRKIYE

Li Stenbolê êrişên dewletê berî Newrozê dest pê kir. Roja 20 adarê bi biryara DGM'ê polîsan avêt ser hemû navçeyên HADEP'ê, NÇM, Rojnameya Azadiya Welat, Kovara Zîndan, Yüz Çiçek Açsın Kültür Merkezi, İdil Kültür Merkezi, Tohum Kültür Merkezi, Evrensel Kültür Merkezi, TUAD û gelek kes binçav kirin. Ev kes êvara 21 adarê serbest hatin berdan.

Li Stenbolê ligel qedexeya Parêzgarîya Stenbolê û bergiriyên dijwar ên polîsan jî gel li gelek deverên Stenbolê Newroz pîroz kir. Bi pey ragihandina di serî de li deverên wekî Yeni Bosna, Halkalı, Ümraniye, Gazi Osman Paşa, Kadıköy, Sarıgazi û Feriköy gel li hev civiya û tevî astengiyên polîsan jî çalakî li dar xistin. Li Yeni Bosna û Halkalıyê polîs, ji bo ku gel ji hev belav bike, gule berdan hewa û di nav de zarok û jin jî gel da ber jop û qalasan.

Di dawîya van çalakîyan gelek kes hatin binçavkirin. Bi agahiyan li Taxa Gaziyê di navbera gel û polîsan şerekî rû daye û di dawîya vî şerî de 2 polîs birîndar bûne. Her wiha li Alibeyköyê jî gel li hev kom bû, agir dada, dîlan gerand û daxwazên gelê kurd diyar kirin. Çalakî bêtêr destkariya polîs çû serî.

Li Edeneyê li taxên Anadolu, 19 Mayıs, Denizli, Mithatpaşa, Gürsel Paşa, Narlıca, Gülbahçe û Dağlıoğlu gel bi girseyî pîrozbahîya Newrozê li dar xist. Polîs li derê çalakî lê hebû, gel gulebaran kir û bombeyên rondikrêj (göz yaşırtıcı) bi kar anîn. Her wiha gelek kes jî hatin binçavkirin. Wekî din bi pey ragihandinan, kesekî bi navê Mehmet Bulgan, ku li Karakola Hürriyetê bûye, ji ber îşkenceyên xedar ji qudum ketiye. Dîsa li Taxa Barbarosê jî kesekî bi navê Ahmet Bilgiç ji ber jop û lédana polîsan bi xedarî birîndar bûye û rewşa wî li ber xetereyê ye. Her wiha li gorî ragihandinan di dema çalakîyan de 20 polîs jî birîndar bûne.

Li aliyê din komeke almanî li Taxa Dağlıoğlu hate binçavkirin. Kom pêşîn bo dozgeriyê hate guheztin, peyre jî hate dersînorkirin.

Li Kadifekalê gel roja 20 adarê dest bi pîrozbahîyê kir. Peyre roja Newrozê gel li hev kom bû û bêyî destdirêjiya polîsan pîrozbahîya xwe pêk anî. Girseyê sloganên "Bijî Serok Apo", "Bijî Newroz", "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok" hildan. Polîsan nekarî bi avêjin ser girseyê lewre jî gef li girseyê xwar û got: "Yekser pîrozbahîyê biqedînin nexwe emê ji we re zanibin!". Di dema pîrozbahîyê de zarokên ku rengên kesk û sor û zer û alên HA-

DEP'ê hildabûn, polîs dane ber keviran. Polîsan piştî pîrozbahîyê avêt ser taxan û gelek kes binçav kirin. Her wiha bi pey ragihandinan polîsan endamên Koma Bahoz û Koma Zozan hildane binçav û amûran wan desteser kirine. Wekî din li gorî agahiyan du trembêlên kesên faşîst hatine şewitandin.

Her wiha li İzmirê li Buca, Torbalı, Yamanlar, Menemen, Narlıdere, Bornova jî Newroz hate pîrozkirin. Li aliyê din hate gotin ku li Bornavayê li 10 zarokên ku hatine binçavkirin, îşkenceye hatiye kirin. Wekî din dema Newrozê Serokê HADEP'ê Ali Yavuz, Jimyaryar Sadık Demircan û parêzer Mustafa İşeri binçav kirin û peyre serbest berdan.

Beşdarî bo pîrozbahîya Newrozî herî zêde li Mêrsînê pêk hat. Dawiyê polîsan bi dehan kes binçavkirin. Li Mêrsînê gel li Taxa Yenipazarê li hev kom bû. Polîsan di serî de xwest mudeheleyî girseyê bike lê ji bo ku hejmara girseyê di demeke kurt de gihîste 20 hezarî polîsan bi girseyê nekarî. Li aliyê din Yarbay Mehmet Özkan bo gel axivî û got: "Ez li ser navê parêzgarê Mêrsînê Nevrûza we pîroz dikim. Armanca me pêkanîna ewlehiya we ye." Yarbay piştî şeker û pirtûk bo zarokan belav kir. Di navberê de girseyê ligel dahol û zirneyê pankartên wekî "Bijî PKK, Bijî Serok Apo, Hezar Silav ji Serok re Bazên Apo" hildan.

Gotarek li ser helwesta Suzan Samancı ya bo zimanê kurdî:

Ne ziman huner gerdûnî ye

Suzan Samancı navê peyvên wekî "êş, pirsgirêk û van" hildide lê nizamim çima zimanê wê lê nagere ku bibêje "Kêşeya Kurd". Ma ev peyv jî sloganîk e? Li aliyê din min fêhm nekir Samancı çima evqas jî ziman, ol û neteweyê ditirse? Ew naxwaze navê wan hilde. Divê bê gotin; tiştê gerdûnî ne ziman e, huner e.

Çiroknivîs Suzan Samancı di van salên dawîn de darî çavan bû. Hem medyaya fermî, hem ya çepgir-sosyalist û hem jî ya kurd bi dûvedirêjî behsa wê kir. Xelata Orhan Kemal jî dane wê. Weşanên medya û wêjeya fermî, dema behsa wê dikin, nabêjin nivîskara "tirk" an "kurd", dibêjin "nivîskara jin a Diyarbekirî û an a ji Rojhilata Başûr." Medyaya me ya çepgir an jî kurd wekî "nivîskareke kurd" jê behs dike û bi vî awayî pesna wê dide. Lê her tişt li aliye-kî, vê hevalê pirtûka xwe ya dawîn di bin rêzêpirtûka "nivîskarên tirk (Can Yayınları Türk Yazarları Serisi)" de tirk da çapkirin.

Her ku pirsên wekî "Tu wekî nivîskareke kurd..." jê tene kirin, her dem vê bersivê dide: "Kurd an jî tirkbûn ji bo min ferq nake. Çunkî zimanê hunerê gerdûnî ye." Di MED-TV'yê de du hevpeyvînan ku ligel we hatibûn kirin, hatin pêşkêşkirin. Di hevpeyvîna dawîn de van gotinên Suzan Samancı bala me kişandin:

"...Min tu caran nexwest zimanekî xav û sloganîk bi kar bînim. Lewre ev nedibû wêje, wê bûbûya gotar. ...Ez li Diyarbekirê dijîm û li vê derê rastiyeke li dar e. Yanê êşek dihate kişandin. Bi rastî ev problem problema Tirkiyeyê jî. Min got ez van tiştan binivîsim. ... Yanî anîha bi rastî dibêjin ku ziman, ol û netewetîya wêjeyê tune. Zimanê hunerê navneteweyî ye."

"...Bi rastî bi baweriya min divê kurdî an tirkîtiya rewşenbîriyê tunebe. Rewşenbîra/ê kurd di nava lêgerînekê de ye. Ez dibêjim ew vê lêgerînekê didomîne. ... Lê ji ber çî ye ez pê nizamim, pirsin ji min tene kirin: "Dibêjin tu rastiyeke dinivîsî an na?" Çunkî dema ku hûn rastiyeke ku nayê pejirandin dinivîsin, bivê nevwê hûn dibin alîgir. Lê ez ji her kesî re dinivîsim. ... Bi rastî min dixwest bi zimanê xwe yê zikmakî xizmetê bikim. Lê belê zimanê min e perwerdehî û rewşenbîriyê tirkî ye. Her wiha ev bi hezaran sal in ku em bi hev re dijîn. Bi kurtayî ez nikarim înkâr bikim ku ez hez ji tirkî dikim."

Niha jî em xwe dixapînin!

Ka werin em tev de gotinên Samancı binixînin. Samancı dibêje zimanê min ne ziwa û sloganîk e. Diyar e bi

baweriya vê hevalê, ji aliyê wêjeyî ve tu girîngiya şîrove û lêkolînên zanistî nîn e. Zimanê çîrok, roman, helbest û berhemên wekî wan "şil" e, lê zimanê yê din "ziwa" ye.

Di nava axaftina xwe de navê peyvên wekî "êş, pirsgirêk û van" hildide lê nizamim çima zimanê wê lê nagere ku bibêje "Kêşeya Kurd". Ma ev peyv jî sloganîk e?

Li aliyê min fêhm nekir Suzan Samancı çima evqas jî ziman, ol û neteweyê ditirse? Ew naxwaze navê wan hilde. Divê bê gotin; tiştê gerdûnî (evrensel) ne ziman e, huner e. Her netewe hunera xwe bi zimanê xwe pêk tîne. Bo nimûne; nivîskarekî/e îngîlîz û ereb bi zimanê xwe berhemên xwe dinivîsin. Ev rûreşî û sosreta mezin, ez jî di nav de, ketiye para me kurdan! Em dixwazin bi gotinên wekî "tirkî an kurdî ferq nake, zimanê huner gerdûnî ye, em ne neteweperest in" vê sosretê û rûreşiyê veşêrin. Demekê hinek sosyalîstên tirk, ereb û faris bi van gotinan hinek ji me kurdan xapandin. İro jî hinek ji me, bi van gotinan xwe dixapînin...!

Xaleke din; Ma çima rewşenbîriya rûs, îngîlîz û ereban dibe

lê ya tirk û kurdan nabe. Wa ye li gorî ku te li ser pirtûka xwe nivîsandîye, tu rewşenbîriya tirkan jî dipejirîni. Bi tenê kurd dimînin. Ma sûcê kurdan çî ye?

Xaleke din a pir girîng: Bi baweriya Samancı "Dema hûn rastiyeke binivîsin bivê nevwê hûn dibin alîgir. Lê ez ji her kesî re dinivîsim." Wisa lê tene ku, Samancı jî alîgiriye aciz e û naxwaze wekî alîgir were binavkirin. Ez jî jê dipirsim: "Yekî/a ku ne ji aliyekî be, wê ji her kesî re behsa çî bike û wê çî biparêze?"

Samancı di peyvên xwe yê dawîn de dibêje: "Ez nikarim înkâr bikim ku ez hez ji tirkî dikim." Hevala delal! Kesî ji te nexwestîye ku tu tiştê înkâr bikî. Lê kesî ji te nepirsiye ku tu ji tirkî hez dikî an na! Bi gotina mezinekî me "ew zimanê ku pê me dikujin." Mirovekî nexwende û nezan bigota, ez ewqas li ber nediketim...

Samancı zimanê xwe nas nake

Ez dibêjim Samancı jî bilî tirkî bi tu zimanan nizane. Ku wê zimanê dayika xwe baş bizanibûya û zargotina kurdî baş nas bikira, wisa nedipeyivî. Ev gotinên min divê wekî dijminatîya zimanekî neyê hesabandin. Bi baweriya min, divê hezkirina nivîskar a li ser zimên wekî mirovên jirêzê nebe. Lewre malzemeya nivîskar ziman e. Divê nivîskar zimanê ku bi kar tîne, baş binase.

Mînakek biçûk; Nivîskarê tirk Adnan Eksigil, di nivîseke xwe ya kovara Birikimê de wiha digot: "Dema ku em li kemilîna zimanê yewnanî binivîsîn, ji serdema Homeros heya îro bi rêk û pêk li dar e û tu caran awarê nebûye. Yewnanîyên ku îro jî zimanê Homeros tiştêkî fêhm nakin, bi xebateke maqûl dikarin bingeha vî zimanî fêhm bibin. Ji Serdema Antîk heya Serdema Bizansiyan, ji Serdema Katarwusa heya Demotîk, béguman di zimanê yewnanî de hin guherîn peyda bûne lê tu guhartin li ber berdehamiya vî zimanî nebûye asteng."



Mehmet Faqîr di vê gotarê de helwesta Suzan Samancı ya li ser zimanê kurdî û rewşenbîriyê dinirxîne û vê pirsê jê dike: "Divê mirov ji Samancı bipirse: Ku tirkbûn û kurdûn ferq nake, ewqas kuştin, îşkence, sirgûn, koçberî, zîndan û hwd... ji bo çî ne!?"

Li aliyê din li Tirkiyeyê rewşekê li dijî vî nimûneyê li dar e. Tirk tirkiya berî vê bi hezar salan an jî sed salan bidin aliyekî, ji tirkiya berî bi heftê salan jî fêhm nakin. Mirovekî herî zana û şareza jî ji vê yekê bêpar e." Adnan Eksigil di nivîsa xwe de zimanê tirkî wekî zimanekî "bêreh û bêbingeh" bi nav dike.

Em vegerin ser gotinên Suzan Samancı. Samancı, li televîzyona kurdan, li pêşberî bi milyonan kurdan, ji dêlawa ku bibêje: Ji ber zilm û zordariya li ser zimanê me kurdan, ez jî wekî gelek kurdan hînî zimanê xwe nebûm. Ev kêmasiyeke gelekî mezin e. Divê em giş zorê bidin xwe, da ku em bikaribin bi zimanê xwe biaxivin. Zimanê me divê were bikaranîn lewre bi hêz û dewlemend e. Heke ne wisa bûya, dê li dijî zilm û zora faris, ereb û tirkan ji holê rabûya. Ez îro jî mecbûrî bi tirkî dinivîsim û diaxivim." Wekî din mirovên ku ketine rojava raya giştî, divê hay ji gotinên xwe hebin an jî lê miqate bin. Dibêje: "Tirkî û kurdî ferq nake."

Divê mirov ji Samancı bipirse: Ku tirkbûn û kurdûn ferq nake, ewqas kuştin, îşkence, sirgûn, koçberî, zîndan û hwd... ji bo çî ye!?"

MEHMET FAQÎR /AMED



Pirtûka S. Samancı ya bi navê "Bihna Gezoyê Dîrûriya ji Hêlîne", bo zimanê hollandi ji hate wergerandin.

Navenda Çanda Mezopotamya
ya Îzmîrê

● 27.03.99 şemî:

Noja xwarînên kurd yê kevneşopî ya 30'î.
Şanoya Hêvî "Qêrînên bêdeng", saet:17.00

● 29.03.99 duşem:

Şahiya cejna qurbanê: Hunermendên NÇM'ê, saet:15.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



● 30.03.99 şêşem:

Şano "Qêrînên bêdeng" Şanoya Hêvî, saet:15.00
YÇKM

● 27.03.99 şemî: Levis Milestone "Miş hu mirov" saet:16.00

● 28.03.99 yekşem:

Tyatro Manga "Kissadan Hisseler" Nivîskar: Haldun Taner,
saet:15.00

Koma muzîkê ya jinan, Koma Asmîn: "Emê dengê jinan bilind bikin"

Go jina kurd di têkoşînê de çawa bala dîrokê û cihanê dikişîne, Koma Asmîn ji parçeyek ji vê yekê ye. Bi hemî jina kurd pêl bi pêl ber bi azadiyê ve diçe. Derfet û îmkân ji bo me jî hene.

Ez pêşî dixwazim vê bipirsim; Asmîn çi ye? Çima Asmîn?

Asmîn navê gulekê ye. Ev gul, an asmîn, gelekî xweşik û bi nav û deng e. Taybetiya gula asmîn a herî mezin, ew e ku li her deverê navê dîtin û bîdestxistin; herwiha asmîn, li bilindahiya ji sê hezar metroyî kêmtir şîn nabe.

Koma Asmîn kengî hat dameziran-din?

Xebatên komê berî 8'ê adara 1998'an dest pê kiribû lê bi awayekî fermî di 8'ê adara 1998'an de hate damezrandin û derkete ser sehneyê. Jixwe, ji bo komê derfet hebûn, hunermend, enstrûmantal û hwd.

Koma Asmîn ji çend kesan pêk tê û kîjan amûran bi kar tîne?

Koma Asmîn ji 17 kesan pêk tê. Ev kes di komên cur be cur de cî digirin. Enstrûmanên komê bi taybetî amûrên wekî gitar (bas, akustîk, elektronîk, klasîk), baxlana, flût, cura, org û hwd. bi kar tînin.

Heta niha Koma Asmîn çend konser pêşkêş kirine?

Koma Asmîn nemaze di rojên taybet de derdikeve pêşberî temaşevanan. Wekî 8'ê adaran û hwd.

Wekî tê zanîn, gelek komên NÇM'ê hene, ji ber çî komeke bi temamî jin?

Mirov nikare bibêje ji valahiya tiştêkî an jî ji kêmbûna koman ev kom ava bûye. Hêvî û armancên koma Asmîn hene. Îro li çar aliyên Kurdistanê û li gelek deverên cihanê jina kurd derdikeve meydana. Rahîştîye çekan ji bo azadiya xwe û xwe ji nû ve afirandinê, gavên girîng davêje. Koma Asmîn jî di warê muzîkê û zamerê de berdewam û bi pêşxistina vê gavê ye. Koma Asmîn mewziyeye jinên



Koma Asmîn bêhtir di rojên taybet de (wekî 8'ê adar û hwd.) derdikeve pêşberî temaşevanan. Stranên wan zêdetir li ser şehîdên tevgera azadiyê yê jin in; jinên xwejinûve afirandine û dîrok nivîsîne. Stranên gelêrî jî di repertûwara wan de cî digire.

kurd e. Hêviya Koma Asmîn, xwedîderketina li jina kurd û azadiya wê ye.

We diyar kir ku gula asmîn, zû bi zû navê bîdestxistin û gelekî xweşik e. Ev ji bo endamên komê tê çî wateyê?

Bingeha avakirina komê ji bo endamên komê jî û ji bo saziyê jî, tê wateya azadiyê û di warê hunerê û kesayetiye de kî çiqasî nêzîkî îdeolojiya azadiyê dibê, ewqas xweşik dibê. Jixwe di vî warê de dirûşmeya me ji bo Koma Asmîn jî derbas dibê. "Ya/ê şer dike azad dibê, ya/ê azad dibê bedew dibê, ya/ê bedew dibê tê hezkirin." Bi gelemperî, armanca NÇM'ê û bi taybetî ji armanca endamên Koma Asmîn ev e.

Koma Asmîn çiqasî dikare hebûna xwe bide der û balê dikişîne ser xwe?

Hebûna komê bi serê xwe gaveke dîrokî û birûmet e. Asmîn bi armanc û hêviyên xwe balê dikişîne ser xwe. Avakirina wê komê ji bo ku tenê ji jinan pêk tê, zêdetir balê dikişîne ser komê.

Komek, an hunermendek bêhtir bi berhem û xebatên xwe balê dikişîne ser xwe, lê Asmîn hem bi xebatên xwe, hem jî ji aliyê jiyanê ve balê dikişîne ser xwe, lê ji ber ku nû hatiye avakirin, kêmasiyên wê hene û em li ser van kêmasiyan hûr dibin. Di diwarojeke dirêj de emê encamên gelekî girîng bi dest bixin. Jixwe

ev pêngaveke dûvedirêj e. Îro jina kurd di têkoşînê de çawa bala dîrokê û cihanê dikişîne, Koma Asmîn ji parçeyek ji vê yekê ye. Bi temamî jina kurd pêl bi pêl ber bi azadiyê ve diçe. Derfet û îmkân ji bo me jî hene. Ji bo meşa azadiyê, li ber afirandina berhem û xebatên bêhempa, tu asteng nîn e. Bi taybetî di vê pêvajoyê de di warekî wekî muzîkê de bi stran û amûrên muzîkê xweifadikirin, gelekî girîng e.

Têkiliyên endamên Koma Asmîn çawan in? Cudatiya têkiliyên endamên Koma Asmîn û yên din çi ne?

Heta ji destê me tê, em hev û din hişyar dikin, rê li ber hev vedikin, kêmasiyên xwe bi mekanîzmaya rexne û xwerexnekirinê, û naskirina bîrdoza Teverga Azadiyê ji holê radikin. Jina kurd ev sê hezar sal in, hatiye çewsandin û ji azadiyê hatiye bidûrxistin. Bi bawerîya me ji mêr bêhtir azar kişandîye. Ev yek pêdiviya jinê bo azadiyê jî ji mêr ferztir dike. Em îro vê yekê di têkoşîna jinê de jî, bi awayekî berbiçav dibînin; ji girêdayîna bi Serokatîyê ve, bigire heta di warê azadbûnê de, çî dibê bila bibê; armanca jinê ew e ku wan xalan yek bi yek bi dest bixe û bi mêran re li ser bingehê rast bimeşe.

Em niha werin ser pirsgerêka jin û mêran. Dema Koma Asmîn hate dame-

zîrandin, hûn bi reaksiyonên çawa re rû bi rû man, bi taybetî ji aliyê mêran ve?

Pirsgirêk, di warê îdeolojiyê de pêşketin an pêşketin e. Ji aliyê hin hevalan ve bi kêfxweşî û dilpakî hate dîtin û alîkariyek mezin nîşanî komê hate dayîn. Hem di warê moraldayînê, hem jî di warê xebatê de. Hin kesan reaksiyon nîşan neda. Her wiha em carinan jî bi reaksiyonên feodal û paşverû re rû bi rû man lê gerek mirov hin rastiyên xwe jî bibîne.

We diyar kir ku di nav komê de têkiliyên berhemdartir in, gelo ev jî ne ji psikolojiya bindestbûnê diqewime?

Ev ne yekalî ye. Îro hêdî hêdî pirsgirêk ji zayendê derbas bûye. Xwesteka azadiyê bingeha vê yekê ye. Hîn jî hin rastiyên me xwe didin der û guhartina wan jî ewqas ne hêsan e. Dema jin û mêr di têkiliyên xwe yê rojane yê civakî û siyasî-polîtîk de azad bibê, wê çaxê mirov dikare bibêje ku têkoşîna rizgariya neteweyî gihîştîye armanca xwe. Ji bo me jî armaca herî mezin ev e.

Di dawiyê de tiştêkî hûn dixwazin bêjin heye gelo?

Me hedefa xwe diyar kiriye. Em dizanin ji bo armancên mezin ked divê, emê vê kedê bidin û di warê muzîkê de emê dengê jinê bilind bikin.

EMÎN BOZAN

Ji tûrikê zargotina kurdî hin dûrik û stran

Xwesteka me kirine wekî ya Mem û Zînê



Baviko

Were baviko bi qurban, parçak ewrî reşî tarî, lo li ser Mêrdînê
Min dît vê sibê ji kula dilê min û te ra
Hew dixwîne lo li ser hêlinê
Bira Xwedê deynê mala fesda û ewana
Çima sala vê salê xwesteka min û te
kirine xwesteka lo Mem û Zînê.
Ax eman eman, sewdalî me dilo...

Were baviko bi qurban, bira germûş li min xela bimîne, lo gundê mezin
Di sera mêrg û kanî, lo rebeno di binanyê da bax û rez in
Minê sala vê salê baxçekî xwe çandibû, xwedî tu yî, cenan ez im
Ax eman eman, sewdalî me dilo...

Were baviko ez bi heyran, bira bajarê Diyarbekirê bişewite, lo rebeno, ne ti war e
Mal xerabo bi ro ewr e, lo baviko bi şev sar e
Malxerabo mere pêşiya jina bi mêr, ne tu dost e, lo ne tu yar e
Tu here pêşiya keçika çardeh salî, weka canika şiv lê nekefî, lo xezal kar e
Ax eman eman, sewdalî me dilo...

Were baviko ez bi gorî, bira baxçê Seyid Elî bişewite, lo bi dar mişmiş e
Mal xerabo alikî mize, lo alikî tîrş e
Yekî di navbera du dilan û çar çavan de, xerabikî bike,
çelê havînê qetran rûnê lo xwîn vereşe.
Ax eman eman, sewdalî me dilo...

Were baviko bi qurban, çima te ez newxestim, lo rebeno nerevandim.
Te ez kirim masîk ji masiyên Gola Xelîlrehman
Avê ji ser dimiçiqandim
Te ez kirim paçekî binsofi li vê xelk û dinyayê lo giş gerandim
Te ez kirim sêvek ji sêvê Meletiyê, di bêrika şalwarê xwe de, lo rebeno çilmisandim
Ax eman eman, sewdalî me dilo...

Were baviko, şeva çûnî êvara înyê, şeva min û te bû
Şeva berê civata siwarên Siwêrekliyan, lo li mala me bû
Destê mi keçikê ji tasa avê, agirê cixarê, fincana qehwê, lo qet boş nebû
Ezê derketme derva, şilî bû, şepelî bû, tarî bû, taristan, lo cî tinebû.
Ez nizam tal e, a min bû lo, nizam bextê te bû
Ax eman, eman, sewdalî me dilo

Herêm: Kobanî
BERHEVKAR: ELÎ ŞÊXO

Meyrê

Newal bidar e lê Meyrê Meyremê
Çolîyam bi dar e ya Allah û Xwedê
Gur tê bi xar e lê Meyrê Meyremê
Gur tê bi xar a ya Alah û ya Xwedê
Çavên gur li kar e lê Meyremê Meyremê
Çavên gur li kar e ya Allah û Xwedê
Kar karika muxtar e lê Meyrê Meyremê
Ew karika muxtar e ya Allah û ya Xwedê

Newal bi bî yê...
Gur tê hêdî ye...
Çavên gur li mîh e...
Ew mîh a Cindî ye...

Newal bi totik...
Gur tê bi lortik
Çavên gur li golik
Ew golika Maxsî ye
Herêm: Mûş

Weylo weylo

(Strana bûkan)

Weylo weylo weylo, weylo weylo weylo
Weylo weylo weylo dil xeribê dayê

Şala bûkan sor e weylo weylo weylo
Xwedîyan girtî dor e, dil xeribê dayê

Şala bûkan reş e weylo weylo weylo
Xwendîyan girtî meş e, dil xeribê dayê

Şala bûkan spî ye, weylo weylo weylo
Xwendîyan xwe da sî ye, dilxeribê dayê

Weylo weylo weylo, weylo weylo weylo
Weylo weylo weylo, dil xeribê dayê

Herêm: Lice
BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎN

Kezîzerê

Kezîzerê Kezîzer
Kerem bike vir de wer
Te ramûs im cardin her
Kezîzerê Kezîzer (dîsgotin)

Kezîzerên me yek in
Ser xanikan dipekin
Bejn birext û biçek in
Kezîzerê Kezîzer
Dîsgotin

Kezîzerên me dudo ne
Ser xanikan bûn zo ne
Wan keziyan dihone
Kezîzerê Kezîzer
Dîsgotin

Kezîzerên me çar in
Ser xanikan bi hejmar in
Bêhna kezyan em xwarin
Kezîzerê Kezîzer

Kezîzerên me pênc in
Ser xanikan wek sênc in
Xwe li hev din dipêçin
Kezîzerê Kezîzer

Kezîzerên me şeş in
Ser xanika dimeşin
Kezîzerin çav reş in
Kezîzerê Kezîzer

Herêm: Mêdîn
BERHEVKAR: ADAR JIYAN

Ji Kom Muzîkê du berhemên nû

Şirketa hilberandin û belavkirina berhemên muzîkê "Kom Muzîk Yapım" bi berhemên xwe yên di warê muzîka kurdî de balê dikişîne ser xwe. Ji roja ku hatiye avakirin heta niha gelek berhemên yên muzîka kurdî gihandine ber destê hunerhezên kurd.

Gelê kurd bi saya xebatên vê şirketê derfet dît ku li CD û kasetên hunermendên mîna Xelîl Xemgîn, Ciwan Haco, Mihemed Arafê Cizrawî guhdariy bike. Vê şirketê du berhemên nû pêşkêşî hunerhezên kurd kirin. Berhemên ku çêlî wan hate kirin, yek a hunermendê navdar Mihemed Şêxo ye û ya duyemîn jî berhemeke gelêrî angoya berhema dengbêj Esker Demirbaş e.

Dil Perîşan im


Şirketa navborî biryar girtiye ku hemû kasetên hunermendê kurd ê navdar Mihemed Şêxo bigihîne ber destê kurdên li bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê. Li ser vê esasê kaset û CD'ya berhema çaremîn a Şêxo bi navê "Dil Perîşan im" gihand ber destê guhdaran. Di berhevoka tomarkirî de deh stranên Mihemed Şêxo cih girtiye. Di nava stranên de bi taybetî strana "Ey Felek" bi gotin û newa xwe balê dikişîne. Di vê stranê hemû kul û kesera

gelê kurd bûye qîrîn û axîn, hatiye ser zimên. Heman şewaz di gelek stranên din de jî derdikeve pêşberî mirov. Jixwe di hemû stranên de evîna ji bo welat û eş û azara gelê kurd heye.

Ev gotinên di strana "Yadê" de her tiştî bi awayekî xweş diyar dikin:

(...)

*Yadê rebenê emê birîndarê xwe derman kin, şehîdê xwe veşêrin
Emê sond bixwin bi Qadî*




Mihemed, Şêx Seîd xewka me nayê

Ew kul ji dilê me dernayê heta em a-la rengîn nebînin serê

Zozanê Kurdistanê hildayî dil bi kulo (...)

Li gorî agahiyên ku berpirsê Komê dane me dê 13 berhemên Mihemed Şêxo jî bêne tomarkirin. Niha jî berhemeke bi navê "Ême" tê amadekirin.

Bavê Dilşayê



Berhema muzîkê ya duyemîn, her wekî li jor jî hate diyarkirin, berhema dengbêjekî ye. Ev dengbêjê bi navê "Esker Demirbaş" jî Erdehanê ye. Li gorî agahiyên ku bo danasîna dengbêj hatine dayin, Esker Demirbaş jî malbatake dengbêj e. Bavê wî û apê wî li gund Murkan ê Erdahanê dengbêjtî kirine. Wî bi xwe jî selik (plak) a xwe ya yekemîn di sala 1973'yan de daye çêkirin. Kaset û CD'ya wî bi navê "Bavê Dilşayê" hatiye tomarkirin. Aliyê balkêş a vê kasetê

ev e ku di nava kasetê de digel stranên serhewayî, hinek stranên govendê jî cih girtiye. Wekî tê zanîn dengbêj kêm caran stranên govendê dibêjin. Stranên di kasetê de hinek ji wan gelêrî ne, hinek jî ji hêla dengbêj bi xwe ve hatine afirandin, lê ew jî bi şewazeke gelêrî hatine amadekirin.

Wekî nimûne, mirov dikare çend rêzan ji strana "Ha sêbe ye tav daye" ku gotin û newaya wê ji hêla dengbêj ve hatiye çêkirin, bide.

Ha bi sêbe ye tav daya wey lor wey lor wey lorê

Qaz peyeka vê da ye wey lor ...


Qaz peyeka vê da ye waxçikê kavir bavê

Keçik mala me da ye wey lor...

Keçik mala me da ye waxçikê kavir bavê

SERVİSA ÇANDÊ

HASAN KAYA



Di 19'ê meha adara 1999'an de, televîzyona tirkî a fermî TRT-1'ê nûçeyekê balkêş weşand. Beriya bi çend salan dîsa bi vî rengî, Ertürk Yöndemê ku di nav çapemeniya tirkî bi xwe de jî gelek caran dibe mijara qerf û tinazan nûçeyekê bi vî awayî weşandibû. Wê demê vî berdevkê şerê psîkolojîk alfabeya kurdî û pirtûka ku zimanê kurdî hîni zarokan dike yên ku Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê amadekiribûn wekî alfabeya PKK'ê nîşan dabûn. Ez bawer dikim wê demê gelek ji me zêde tu mane nedabû vê helwestê. Ji bo alfabeya kurdî hatibû gotin ku alfabeya PKK'ê ye.

Heta niha li tevahiya cîhanê kesî bi çavên serê xwe dîtîye ku alfabeyek bûye ya partî, rêxistin an jî beşek ji ya civakê. Helbet xwediyê vê propagandaya şêlû jî baş dizane ku alfabe ji bo neteweyekê ye. Sîstema tirkî

bi vê helwesta xwe xwediyê du armancan e. Yek jê ew e ku dibêjin ha kurd ha PKK e, qet nayê guhartin. Ya din jî ew e ku, ew kurdan netewe napejirînin. Jixwe yê ku ne netewe be nabe xwedî alfabe jî.

Belê, bila çavên yekîtîya weşanvaniya televîzyonê ya îngilîz û hemû Ewropayê ronî be, careke din tirkî di ekranên xwe de alfabe ya kurdan danîbû nik bombe û sîlahan. Televîzyona tirkî ya resmî di nûçeyên xwe de, digot ku kesên ku ji bo esareta serokê gelê kurd hinek cih bombe kirine, ji aliyê polîsan ve hatine girtin. Ji wan her du kesan yek jê keç bû û kifşî dibû ku zêde îşkence li wan hatiye kirin, ew li ber maseyekê dabûn rawestandî. Demançe û bombeyek li ser maseyê bû. Li aliyê bombeyê alfabeya kurdî, li aliyê demançeyê jî pirtûka bi navê "Xwendin Ronahî ye" hebû. Ev pirtûk ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê ve jî bo ku zarokên kurdan hîni zimanê xwe bibin hatiye amadekirin. Pirtûk ji bo zarokan e û bi tenê yek peyva siyasî jî tê de tune ye.

Di vê rewşa ku kurd hemû li ser lingan in, serokê wan hêşîr e û hemû kurd hasas in de çima dewleta tirk alfabeya kurdan datîne nik sîlahan. Li gorî baweriyaya min ew mesajê

didine kurdên ku dibêjin "tu têkildariya me bi teq û reqê re, bi sîlahê re tune ye, em kurdên sernêrm û biaqil in." Ew mesajê didine partî û kesên ku dibêjin "em alîgirê aşîtiyê ne, em doza mafê çandî dikin."

Mesaja wan jî tê vî maneyê: Kurdê ku li kurdîtiya xwe derveke ji min re hedef e. Kurdên ku serxwebûnê dixwazin ên ku federasyonê dixwazin, ên ku otonomiyê dixwazin qet ferq tune ye, hemû hedef in. Lê bi dorê ye. Yek bi yek dor dê bê ser wan.

Delîleke vî helwesta dewleta tirkî jî dîmenên zarokên kurd ên ku di pîrozkirina Newrozê de, di ekranên televîzyonên tirkî de hatibûn nîşandan in. Di pîrozbahîya Newroza 1999'an bêje hema li hemû deverên tirkî û Kurdistanê hêzên dewletê êriş biribûn ser girseyên gel. Hemû televîzyonan di ekranên xwe de cih dane zarokên ku ji aliyê polîsan ve hatine derdestkirin. Polîsan qefle bi qefle zarok li dû hev rêz kiribûn. Tiştêkî pir balkêş bû, di nav zarokên ku hatine derdestkirin de yên ku temenê wan pênc, şeş an jî heft sal bû jî hebûn...

Maneya vî tiştî çî ye? Ku zarok be jî kurdê/a ku serê wî bilind be nabe, divê serê wî/ wê were tewandin. Ev dewlet tu caran li kurdên serbilind tehemûl û qebûl nake.

Xalê Osman û zabite

Xalê Osman cara yekemîn bû ku hatibû Stenbolê. Ji xwe re li kar digeriya. Tu kar bi dest wî neket ku ji xwe re bixebite. Ew bi qasî deh rojan di nava kolanên Stenbolê de zikê têt, yek birçî digere. Mecbûr dimîne diçe Kûçûk-pazarê ji xwe re tableyekê dikire. Roja paştir diçe hela fêkiyan ji xwe re hinek fêkî dikire û li tableya xwe bar dike, berê xwe dide nava sûkê. Li Meydana Aksarayê li ber deriyê Metroyê tablacî giş kom bûne ji xwe re tiştan difiroşin. Xalê Osman diçe xwe dike nava wan. Piştî demekê, zabiteyên belediyeyê têt, her kes radihêje tablayên xwe direve. Ji ber ku Xalê Osman cara yekem vî karî dike, haya wî ji tiştên wisa nîn e. Lê ew jî tableya dihêle û direve. Zabite têt tablaya wî hildigirin û hemû fêkiyan dirijînin û diçin.

Alşo

Nasnameya Kurdistanîyekî tevî kincan têt şuştin û parçe parçe dibe. Rojê derdikeve nava sûkê, polis pirs nasnameya wî dikin. Ew wê nasnameya peritî nîşanî polîsan dide. Polîs dibêjinê: "Çi li nasnameya te qewimiye?" Ew wiha lê vedigerîne: "Yahu polis beg! Li min bibore! Tevî kincan hatiye şuştin." Polîs

dibêjê: "Çawa! Ma mirov nasnameya xwe wisa dike? Tu heqeretê li ala Tirkîyeyê dikî!" Yê Kurdistanî lê vedigerîne: "Bi Xwedê polis beg! Min li nasnameya xwe nihêrî, ew ala li ser gelekî qirêj bû. Min jî ew avêt makîneya kincan...!"

Şêx û şeytan

Sê mirov di rê de li hev rast hatin, kêf û şahî li hev dan û bi hev re riya xwe domandin. Ji rêwîyan yek jê şêx, yê din êzîdî bûn. Lê haya wan ji hev tunebû. Hinekî meşîyan lingê şêx li kevirê alîqî û li erdê dirêj bû. Her du rêwîyên êzîdî, şêx ji erdê rakir. Şêx got: "Tû lanet li şeytan! Piyê xwe da ber piyê min ez li erdê dirêj kirim" Her du rêwîyên êzîdî awirêkî tûj bi şêx vedan û dan ser riya xwe. Hinekî meşîyan şêx li saeta xwe nihêrî û got: "Tû! Lanet li şeytan! Çaxê nimêja min çû!" Dîsa her du rêwîyên êzîdî awirên tûj bi şêx vedan, yek ji wan ber bi şêx ve meşîya da ku lê bixe. Lê hevalê wî nehişt. Dîsa riya xwe kudandin û li dora satekê meşîyan. Dawiyê gihîştin ser pîrekê. Li vê derê lingê şêx di qula nava pîrê re çû xwarê û piyê wî şikest û îcar bi nalenal got: "Tû lanet li şeytan!" Her du rêwîyên êzîdî yekser berê xwe da şêx û got: "Welleh şeytan jî zane tu ne li ser ri-



ya rast î, heta ku piyê te şikênand!" Peyre wan şêx girt ji pîrê avêt xwarê.

Sola min li gund ma!

Apê Kerîm bi şev û roj şivantî dikir. Her çar wextê her tim li ber pez bû. Du zarokên wî hebûn. Navê yekê Gulê bû yê din jî Kenan bû. Qîza wî mezin a mêran bû. Yekî gundî têt, qîza wî ji lawê re xwe re dixwaze. Apê Kerîm qîza xwe didê. Lê ji bo qîza wî hinek cihêz pêwîst e û lewre divê ew biçe bajêr ji bo qîza xwe

cihêz bistîne. Apê Kerîm çil sal emir kariye lê heta wê rojê qet li erebeyan siwar nebûye. Apê Kerîm diçe ber erebeyê û ber disekine. Sola xwe ji piyê xwe dixwe li erebeyê siwar dibe û erebe ber bi bajêr ve bi rê dikeve. Bi vî awayî ew digihîje bajêr, dema ji erebeyê peya dibe dinêr ku sola wî tuneye, pêxasî dikeve nava sûkê, dema bajarî jê dipirsin, dibêje: "Sola min li gund ma."

BERHEVKAR: KAZIM EKİNGÎ


BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (165) XAÇEPIRSA

1	D	M	W	A	A
2	L	E	T	S	U
3	A	S	T	S	A
4	O	A	K	T	I
5	A	Z	A	R	S
6	I	R	A	N	R
7	E	I	M	A	L
8	T	I	S	A	W
9	S	U	N	A	T
10	K	A	T	A	K

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsa 163'yan


Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya peşkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 165'an, pirtûka "Zwanê ma alfaba ma" ye.




Jêrenot: Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên xelata hejmarê 163'yan, pirtûka Hasan Kaya "Gimewas" qezenc kirine: Nihat Oruç /Ruha, Firat Gündüz /Ruha, Kubalyî Türk /Ruha, Adule Turan /İzmir, Sevgi Taş /Stenbol

Wezîrtî Rêberêk	Rengê Henek	Kurtînivîsa bijîşk Lêkerêk	Serbestî paşgîrêk	Sembola Oksîjenê Bi tirkî dayîk	Beşêkî çepîlê mirov
					Sala em tede
Aqilmend Dijwateya germ			Şîyan, karin Bi kirdî hinek	1	
	2	Dengdarê n'notê Qulqulî, hindi	Hestiyê mezin Notayek		
Kok Notayek		Hêl, lay cureyêke elegê			Lê genim tê hêran 5
	Parzemînek Çerçî			Kurtîya Rêhewayaya Hollandayê Hucre	
Emir Tîpeke kurdî			Bextewarî		
4	Dijwateya ron Cînavkek				Li ku ye?
Nexweşiye k Şerxwaz	3	Hêsan Gîhaneke k			
					Cînavkek



PEYVA VEŞARÎ



BÊJING

MEM KAYA



ÎMRALÎ RA XEBER ESTA

Lazim o ke tenya mendin ra bixelsiyo

MEMED DREWŞ

Heweyê xebere estê ke ganê kesî nêwazena binûso. Feqet mec-bûr maneno binûso. Çi ke karê ci xebere nûsteno. Coka xebere ke kewî ci dest, a xebere rind bo jî, ar bo jî, lazim o ke ay binûso. Binûso ke wendoxî û şar jî biyayan ra xebere dar bo.

Xebera mina ewroyin jî nînan ra ya. Her çiqas ganê min mewazo jî lazim o ke, ez binûsî û şima derheqê rewşê Öcalanî de xebere dar bikirî.

Ze ke yeno zanayin hinî her rojo hîreşeme û îne abûkatê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî yê şinê Girawê Îmralî û eya pêdiyin virazenê. No hefte jî rojo îne winî bi. Abûkatanê Öcalanî ra A.Zeki Okçuoğlu, Niyazi Bulgan û İrfan Dünderî ya piya şî Girawê Îmralî û Öcalanî ya pêdiyin viraşî. Rojo şeme jî ma şim bûroyê abûkatê Öcalanî û ma derheqê rewşê Öcalanî de abûkatana qisey kerd. Ez bi xo abûkatanê Öcalanî nezdî ra silasena coka firsent ke kewî mi dest ezo hema şima abûkatan het.

Heftayo verîn moralê abûkatan pêrin rind bi û çimê abûkatan wiyayê. Feqet no şiyayin de zey heftayê verîn nêbi. Moralê pêrin xirab bi. Tabî seni ke ma no rewşê abûkatan dî, bi rasti ma tarsayim ke teva pers bikim. Ma ewnayim înan ra, ê ewnay ma ra. Peynî de ma nêşa vindim û ma mesele a-

kerd. Mesele abiyayin rê abiyê feqet fekê abûkatî nêabiyayê. Tabî ma tahmîn kerd rewş seni o. Ma heftayo verîn nûst "Rewş rind o Xoverdayino rameno". No hefte xoverdayino rameno, feqet rewş goreyê heftayê verînî rind niyo. Abûkato vano ke, kes ronîştin û vatenana nêşeno Öcalanî rê wayir vejîyo. Lazim o ke teva viraziyo. Çi ke, her çend xover bido jî tenyamendin kesî ecizneno û dîşlixê kesî nîno. Tevayo winaynîn jî rewşê ê mardimî xeripneno (keno xirab). Nê biyayan ra yo ke Öcalan nezdîyê 15 kîloy sahtiayo. Abûkato nê vatenan bi taybetî qandê Ewropa ano ziwan û wazeno ke şar û dostê ma yê ke, Welatanê Ewropa de ronîşenê, lazim o ke qandê rindkerdina rewşê Öcalanî heveya vêşî (zaf) bixeftiyê. Haqanê xoyê demokratîkan hetanî peynî bixeftinê.

Kiştê bîn ra dewleta tirk Öcalanî ze ke girotxane (hepis)de nîşan dana, no jî rast niyo û zey vatenanê verînan zûr o. Öcalan girotxane de niyo. Öcalanî hewna Qereqolê Artêşa Tirk de wo. Êkê çorşmeyê Öcalanî de gardiyani niyê, endamê kontrgerila yê û her roj nameyê komîsyonê perskerdini de, 2 heyetê yenê Öcalanî het û ci ra persî pers kenê. Nê heyetan ra jûya rolê rindî kaykena a bîna jî rolê arin kaykena. Tabî iyê winakerdina wazenê Öcalanî faqta xo finê. Feqet Öcalan tevera seni bibi belayê sereyê înan nika zere de jî Öcalan biyo belayê sereyê înan. İnan

Öcalan esîr giroto. Feqet Öcalano zey teverî fikirayin û zey teverî zîrar û zîyan dewletdayin devam keno. Dewleta Öcalanê esîrî ra, verî ra vêşî (zaf) tarsena.

Ancî (onca) hetanî nika ne jew rojname û kovar dayo Öcalanî û ne jî viradayo ke Öcalan biyayanê teverî ser xebere dar bo. Jew çend pirtûkê dîrok diwayî ey. Xora ey bi xo jî abûkatan ra pirtûkê dîroka dewletanê tirk û tekiliyê şarê kurd û tirk ser waştê. Öcalano mehkema de nînan sero vindiro.

Qandê rewşê Öcalanî nezdî ra û rind fahmkerdini ezo wazena wina nîmûne bidî. "Bifikiryê û xo jew keyî (çê) miyan de zey kor û kerî bihesibnê û nînan het vardayinê psîkolojîkî, nînan het jî heyeta perskerdina bêro şima het û ze ke şima ra hesab pers bikiro".

Nînan bifikiryê û rewşê Öcalanî tahmîn bikirî! Ezo bawer kena eke şima wina bikirê, rewşê Öcalanî nezdî ra fahm kenê. Çi ke ezo seni kena nêşena nûstena biyarî ziwan. Coka wazena ke şima xo tahmîn bikirê.

Lazimo ma tevayê bikirê û Öcalanî rewşê ewroyin ra bixelsinê. Teva nêkerdina slogan çekerdina (eştina), Öcalanî rê wayir nêvejiyeno. Hetanî nika Öcalan qandê rindîna şima xeftiya, oyo bixeftiyê jî lazim o ke ewro jî şima qandê rindîna ey zor bidê xo û xorê wayir vejîyê û ey tenya mendin ra bixelsinê.

NEWROZÊ ŞIMA PİROZ BO

Rojo şeme bi.Yanê 20'ê menga adar û erefe Newrozî. Qandê ma rojo şeme jî biyo rojo mahnayin. Çi ke o roj, biyo rojê Îmralî ra xebere girotin. Seni ke o rojo yeno, hema mayê verê xo a çarnemi hetê bûroyê abûkatanê Öcalanî û kewmî ray û înan ra xebere darê pîrozana gemi. No hefte jî ma winî kerd. Karê ma abûkatan het qediya û ma ageyrayim rojname. Hewna ma nêronîştim kever ceniya û zey hoviyan kewtî zere.

Ma jew odedê rojnamey de arêkerdîm pêser û hema çayê rojnamî nezdîyê di seatan geypay. Tabî mayê nêzami iyê ma bigirê binçim û mayê Newrozî binçim de şarê xoya piya pîroz bikim. Coka mayê ancî jî meşt ser fikiriyemi. Fina ma ewnayim ke ma girotîm û bardîm Emniyetê Stenbolî. Ti mevaj ke dewlet qerar dayo, ay tornanê Asîrkar Kaway û embazanê Mazlûm Doğanî bigiro binçim û teverî tornanê zilimkar Dehaqî rê biterno û Newrozo ke hetanî vizêr qebûl nêkerd û qandê vera ci girotin desana vîstana kurdî kiştî, aya nika ey goreyê zanayina xo pîroz bikiro. Namayê Newrozî jî Nevruz bikiro. Tabî qe nêfikiryê tornê Asîrkar Kaway û embazê Mazlûm Doğanî cehnimî bind bê jî Newrozî pîroz kenê û Newrozî teslimê tornanê zilimkar Dehaqî û embazanê Ecevit û Türkesî nêkenê.

Şewa 20'ê menga adar seata ke Kawayê Hemdem Mazlûm Doğanî adirê azadî fistibi ci, ma jî binçim de Newrozî sera 1999 sloganana û marşa xoya neteweyiya pîroz kerd. Tornanê asîrkar Kaway emser jî wastena tornanê zilimkar Dehaqî ci qiriq de ternê hem zere de hem tevera.

Newrozê şima pîroz bo.

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
(Beşiktaş/İstanbul)
TEL: (0 212)

245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerîmendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRİAY Dağım
■ NİVİSGERÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mîrsîn
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmîr
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02
■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78

■ (Nûnerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Fransa:
M. Ali Doğan
Tel- 33 614 32 43 55

■ Belçika
İ. Can
Tel:32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzî
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Almanya:
Fener Rojbiyanî
Tel: 49 228 92 51 284
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv

tirkiye

Endamê Konseya Serokatîyê û

Komîteya Navendî ya PKK'ê Cemil Bayık:

serdanpê qada şer e

Tirkiye serdanpê qada şer e. Kî dê kengê, çawa, li ku beramberî şer bimîne ne diyar e. Divê ev daxuyaniya bo tûrîstan li ser bala herkesî be. Em tu caran ne li dijî mafê gerê ya tûrîstan in. Lê qezencên tûrîzmê gelekî bi kêrî şer tên. Di mercên şer de piştgiriyeke wiha ne rast e. Divê herkes ji vê yekê haydar be."

Rojnameya Özgür Politikayê li ser rûdanên dawîn, bi endamê Komîteya Navendî û Konseya Serokatîyê ya PKK'ê Cemil Bayık re hevpeyvînek kir.

Me navê zerar bigihêje tûrîstan

Cemil Bayık li ser kêşeya tûrîstan wiha axivî: "Biryargeha Navendî ya ARGK'ê bo ku tûrîst neçin Tirkiyeyê daxuyanî da. Wekî tê zanîn piştî 15'yê reşemiyê çî li Tirkiyeyê çî li Kurdistanê reaksiyonên gelê kurd gur bûn. Lewre jî şer li her derê belav dibe. Tirkiye serdanpê qada şer e. Her mirovê ku biçê qada şer, dibe ku ji şer xesarê bibîne. Kî dê kengê, çawa, bibîne ne diyar e. Lewre jî ARGK'ê pêwîstiya daxuyaniyeke bi vî rengî dît. Divê ev daxuyanî li ser bala her kesî be. Em tu caran ne li dijî mafê gerê ya tûrîstan in. Lê qezencên tûrîzmê gelekî bi kêrî şer tên. Di mercên şer de piştgiriyeke wiha ne rast e. Divê herkes ji vê yekê haydar be."

Çalakiyan em li dar naxin

Li ser çalakiyên ku di vê pêvajoya dawîn de pêk hatine jî Cemil Bayık ev nirxandin kir: "Piştî 15'ê reşemiyê serdemê nû dest pê kir. Neheqiyêke pir mezin li gelê kurd û Serokatîya wî hate kirin. Teroreke mezin hate meşandin. Lewre jî kurdan nerazîbûna xwe nîşan da û dê nîşan bidin jî."

Xeta leşkerî û çalakiyan a PKK'ê tê zanîn. Çalakiyên ku li dar dikevin li derveyî xeta me rû didin. Hin der û dorên din van çalakiyan li dar dixin. Em dixwazin wan kesan nas bikin. Ev kes dixwazin çî bikin? Van çalakiyan bi awayekî demdemî li dar dixin an birêxistinî? Lewma jî bi PKK'ê re têkildarkirina wan ne rast e. Hedefa PKK'ê diyar e. Hêzên navborî çiqasî bi hêz in? Ev hêz dikarin çiqasî van çalakiyan bidomînin? Me agahî nîn e."

Di stratejiyê de guherin nîn e

Bayık li ser stratejiya PKK'ê jî wisa peyvî: "Guherîna stratejiyê girêdayî mercan e. PKK'ê hin gav avêtin, xwest ji warê leşkerî dakeve warê siyasî, kêşeyê bi rengekî siyasî çareser bike lê KT'ê tu gav neavêt. Helwesteke berevajî vê gavê

girt. Li dijî PKK'ê kompoyeke mezin hate lidarxistin. Lewma jî ji PKK'ê payîna guherîna stratejiya wê safikî ye. PKK dê li ser stratejiya xwe têkoşînê bidomîne."

Cemil Bayık li ser nêzîktêdayîna Amerîkayê jî wiha got: "Amerîkayê hetanî îro piştewaniyeke mezin da dewleta tirk. Di komploya dawîn de rola wê darî çavan e. Serokatîya me gelek caran bang li Amerîkayê kir, xwest ku piştgiriye nede dewleta tirk û ligel komkujiya dewleta tirk ku li dijî gelê me dimeşîne cih negire. Lê mixabin DYA'ê guh neda bangên serokatîya me. Di komploya li dijî serokatîya me de bi roleke mezin rabû. Em bang li DYA'ê dikin ku piştewaniya KT'ê neke. Ger heman helwestê bidomîne, bêguman gelê me jî dê li dijî wê helwesta xwe bigire."


Ewrûpa naxwaze kêşeyê çareser bike

Bayık li ser pirsra bi rengê "Hûn helwesta Ewrûpayê ya li ser Kêşeya Kurd çawa dinirxînin" wiha got: "Ger van hêzan bixwesta, ev kêşe dê ji mêj ve çareser bûbûya. Lê xuya ye ku ew naxwazin çareser bibe, berevajî vê yekê rê li ber çareseriyê girtin. Ger ev hêz piştewaniya KT'ê nekin, ew nikare rojekê jî vî şerî bigerîne. Ger çareseriyê dixwazin, bila bo çareserkerinê tevbigerin."

Amerîka, Ewrûpa û Almanya li ser dewleta tirk gelekî karîger in. Tirkiye bêtî wan nikare gavekê jî biavêje. Serokatîya me bi çûyina xwe ya Ewrûpayê re xwest hewldana wan a bo çareserkerinê hêsantir bike. Lê hêzên navborî xwe nedan ber û di nava kompoyê de cih girtin."

Mûxatap Serok Apo ye

Cemil Bayık der barê rewşa Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî ev nirxandin kir: "Çareserkerina Kêşeyê bi mûxatapgirtina Serok Apo pêkan e. Lê ger bixwazin bi îmhakirina Serok Apo bigihêjin encamê, ev ne mimkûn e. Ev yek tu car kêşeyê çareser nake dê dijwartir bike û şer dê xedartir bibe. Ev şer dê tenê berjewendiyên Tirkiyeyê neke xetereyê, di heman demê de dê berjewendiyên gelek hêzên li Tirkiyeyê têxe xetereyê. Lê heke bixwazin Serok Apo wekî rêberê gelê kurd ê rewşa binasin û digel wî kêşeyê çareser bikin, bêguman statûya wî dê bo çareseriyê xizmetê bike."



Eger hinek derûdor bibêjin me Serok Apo dil girt, em dikarin bêtesîr bihêlin, li ser PKK'ê dek û dolaban bigerin, bila zanibin ku di nava şaşiyêke mezin de ne."

Em darizandina Serok Apo qebûl nakin

Cemil Bayık der heqê darizandina Öcalan jî ev nirxandin kir: "Wekî tê zanîn ne ev netewe, ne kesayetiyên wê û ne jî dostên wê, dê tu car vê yekê qebûl bikin. Eger bi rastî bixwazin Serok Apo an jî di kesayetîya wî de neteweyekê, mirovahiyê bidarizandinê û bi îmhakirina wî vê yekê bibin serî, gelê kurd û dostên wî dê bersiveke dijwar bide wan. Divê herkes vê yekê zanibe. PKK û gelê kurd dê tu carî destûra darizandina bi vî rengî nede. Me tim û daîm got, Serok Apo ne şexsek e, serokê neteweyekê ye. Kompoyên ku li dijî wî li dar dikevin, li dijî neteweyekê li dar dikevin. Bêguman neteweyek tu car serê xwe li hemberî vê yekê natewî-

ne. Divê bê zanîn, dibe ku reaksiyonên ku tu kes jê napê derkevin holê. Lewre jî divê hemû hêzên navneteweyî û derdorên demokratîk bi baldarî li ser vê darizandinê hûr bibin."

Endamê Konseya Serokatîyê ya PKK'ê Cemil Bayık di dawiyê de jî bo rewşa siyasî ya pêşerojê da zanîn ku niha bi awayekî siyasî çareserkerina pirsgerêkê di rojê PKK'ê de nîn e û got: "Serok Apo bo çareserkerina kêşeyê gelek caran bang li dewleta tirk kir, sê caran agirbest ragihand. Wî got: "Di vî warî de PKK'ê wezîfeya xwe bi cih anî. Bêguman ev yek girêdayî Serok nîn e. Nêzîktêdayîna aliyê din girîng e. Bo me her gav gotina Serok Apo ferman e. Serok Apo, ger fermanekê bide me, bo bicihanîna wê em amade ne. Divê kes tişteki din ji me nepê. Ji navendê bigirin heta şervanên ji rêzê, PKK di bin fermana Serok Apo de ye."